Dotmam

Rewşen Bedirxan



avesta

re ji min re got ku wê piştre bi min re biaxive ji ber ku aniha nikare. Ji ber hinekan xwe nêzîkî wê kirin. Di singa holê de Efleq rûniştibû, li dora xwe dinêrî. Ez hilkişiyam oda xwe berî ku ez silavê bikim. Bi rê de min endamekî yonanî dît, ji min pirsî ku ezê beşdar bibim? Min bersiv da ku ez dixwazim bimînim dawiyê, ji min re got: bijî, sebir û bihnfirehî baş e û ev nîşana bilinbûna mebesta te ye. Teqez wî tiştek bihîstiye, loma vê yekê dibêje. Min qehwe û şîr ji xwe re xwest. Min ew vexwarin û hebek hêminiyê jî vexwar da damarê min bihedinin hinekî.

Xwedê kirî ku Celal (Talebanî) beşdar nebû, wê di astengiyekê keta yan jî wê xwe dûrî şandê bixista. Ji herduwan wê yek bikira, yan na jî wê weke min bê xew û xwarin bimaya, û nizanî bê wê encam çi bûya.

Bi her hal ez ne poşman im. Bi kêmanî ala me kete nava alên welatan de û biyaniyan dîtin bê çawa rojhilatiyan arma Kurdistanê ji ser masê rakirın û ji lihemberbûna cezayiriyan ji temsîla Kurdistanê re agahdar bûn. Ev besî me ye, ji ber wê gelek bixwazin di vê riyê de pirsa kurdî nas bikin, û sibe ku xwedê bê erê ezê bi ewrûpiyan re biaxivim. Çi îşê min ji wan e? Min bi xwe destê xwe ji karê (wezîfa) xwe şûştiye û rehma xwedê lê be!

Ji saet heft de ez di xew ve çûm û 12 seetan di nav nivînan de mam. Îro ez ji xew rabûm û rewşa min baştir bû. Piştî min qehwa xwe vexwar ez saet 08:30 daketim. Min li Berîdê pirsî, ji ber min nameyek ji Misrê re şandibû û li ser 300 draxma sekinî, 36 lîreyên Sûrî, ji ber wê min newêribû nameyekê ji Moskow re bişînim. Ezê li benda roja 5ê mehê bim. Dema kongre bi dawî bibe, ezê herim hotêleke erzan. Ezê li perê xwe binêrim, dema ku hebin ezê nameyê bişînim û xem nîne ez bê pere vegerim Beyrûtê. Bes ku kerta min a seferê heye. Min nameyek ji Selah Saadela re şand. Tê de bi firehî ez li ser rewşa xwe diaxivîm û yeke kurt jî ji Sînemxan û Cemşîd re.

Bi riya vegera min a hotêlê min Fatih Esbîro dît. Ji min pirsî ku ezê bi wan re biçim seyranê û gelekî xwest ku ez bi wan re herim. Min qet biryara seyranê nebihîstibû. Ji hêla dirustkirina van tiştan ve gelek kêmasiyên komîteya amadekar hebûn. Sedema vê yekê jî perçebûna di nava rêzên wê de ku ji bo cezayîriyan çêbûbû.

Bi her hal, çawa ez vegeriyam hotêlê, yonaniyan ji min pirsî: tu bi me re nayê? Min got: belê. Û bi vî hawî di saet 10:30 de em li basan siwar bûn da em herin, min hişt ku Sûriyî siwar bibin û piştre ez nêzîk bûm, hema min dît ku Muzher Şerbecî û yekî din bang dikin Ebdulkerîm yan Zuhûr. Basa xwe hiştin û ketin basa ku ez tê de me. Ji şansê wan re kursiyê pişt min vala bû, hema tê de rûniştin.

Di rê de min seroka partiya jinên yonanî nas kir û adrêsa xwe da min. Em li ser rewşa kurdan bi dirêjahî axivîn, dengê me diçû teşqeleciyan.

Min şanda îtalî jî nas kir. Şanda cezayirî a ku di nêrîna xwe de ne wek cezayiriyê din in û ne wek Komîta Erebî ne jî di riya parastinê de li ser Cezayir. U ev bû sedemek ku bibe mîna

bumbeyekê û biteqe. Civîn rabû da bêtir roja din nêrînên wan nêzîkî hev bikin û ew jî ma li ser a xwe an na wê xwe ji kongreyê vekişîne. Ew xortekî rewşenbîr û zane bû, bindest bû, çar salan di zindanê de mabû û aniha li Roma nişstecî bûye. Carna bi dizî diçe Cezayir da kar bike. Van tiştan yekî fransî ku dijî siyaseta Fransa bû ji min re gotin. Ew doktor Kamiran nas dikeû di riya wî re gelek tişt ser pirsa kurdî dizanibû. Em li ser kurdan axivîn û çawa ez mecbûr bûm bi tena xwe hatim vê kongreyê ji ber serkutkirina ku li ser kurdan dimeşe li welatê wan ê perçekirî di nava (Tirkiye-Iraq-Sûriye-Îran) de. Piştî wê rojnamevanê yonanî ji min pirsî li ser sedema vekişîna min. Min bi rastî jê re bersiv da li ser bûyerên ku bûne. Rabû xeber û sixêf ji şanda sûriyan re dan û got: Ew hatine vir ji bona şerê koledaran bikin lê ew bi xwe koledar in.

Efleq neçûbû seyranê. Em saet çar vegeriyan û min ji Marî re got ku min agahdar bike ku civîn hebe da ez dakevim.

Dema ez vegeriyam, rûniştina min li cem yekî misrî ket. Ji min pirsî ku ez zanim bi zimanê ingilîzî? Min bersiv da: belê ez bi erebî jî zanim. Xwe kir weke yekî matmayî mabe. Û got: min bihîst tu kurd î û tu hatiyî da ku welateki ji kurdan re bixwazî. Tu li dijî Sûriye kar dikî, vêga tu çawa bi erebî dizanî biaxivî? Min got: yê ku wisa ji te re gotiye rewşê baş nizane. Belê ez kurd im, lê ji ber ku welatê min Kurdistan perçe bûye, ez li beşê Sûrî ketime û ji ber wê ez Sûrî me. Regeza min Sûrî ye û ez hatime da di ber miletê xwe de biaxivim û ez bidim xuyakirin ji kesên bi namûs re ên weke te zilm û zordariya ku li ser miletê min dibe û van tiştan şirove bikim. Xwezî te zû nekira û tu maba heta min gotina xwe bixwenda da te guhdarî bikira û tu dilniya biba ku em ne dijminê miletê ereb in û ne jî dijminê miletê tirk in, ne jî yê fars in. Em li dijî koledarê ku welatê me perçe kiriye, em li dijî zordariyê ne û em dixwazin wê ji ser xwe rakin. Ez dibêm qey ew 16 milyon kurdên li Tir-

kiye û Îran û Iraq û Suriye hêjayî jiyanê ne û rakirina zordariyê li ser wan. Xwezî we li ser wan bixwenda û hûn li ser wan biaxiviyana. Ew ji dibû rêk ji banga mirovatiya li dijî koledariyê re.

Min jê re rewşa kurd şirove kir û çawa dema vexwendina kongreyê hat kesekî ji bilî min nedikarîbû bihata. Ji ber astengiyên jiyanê ê ku miletê me tê de derbas dibe li Kurdistanê. Û min berdewam kir: piştî te ev zilm û zordarî li ser wan bihîst, ma tu naxwazî alîkar bi ji bo rakirina vê zordariya li ser wan?

Dema em vegeriyan hotêlê, got: tu bi xêrê hatiyî, derfetek baş bû min tu nas kirî û te gelek pênasîn li ser kurdan dane min, ên ku min nizanîbûn.

Bi her hal ez bê hêvî bûbûm û wê sibe çî din ji min re derxînin?

04.11.1957

Bi şev min ji Useyma û Sînemxan û Celal (Talebanî) re nivîsand. Marî (sekretêr) hat û navê min û nasnavê min û nave Kurdistanê ji min xwest. Ez têgihiştim ku ji programa xwe rakirine û yonanî jî serhişk in. Her carê dîsa bizava xwe dikin, ji min re got min nexwest tu dakevî da ziryan gurtir nebe, besî wan e ku aniha bi cezayiriyan ve daketine.

Ez baş ranezam ji ber gelekî ne li ser hev bûm. Tiştê min dixwest ku mebesta min bigihê serî û ez gotina xwe bixwînim. Ez rojnamevanan kom bikim da ez nûçeyan li ser rewşa Kurdistanê û zilma bi ser serê miletê kurd bidim nasîn. Piştre çi dibe bila bibe!

Saet aniha 08:30 e û her kes dibeze basan da dakevin bazarê ji xwe re tiştan bikirin. Bêguman rewşa wan ne weke a min e, ji ber wê ne xema wan e bi wan tiştê ku ji wan tê xwestin.

Wê civîn nêzîkî saet deh be, û ez li bendî taştê me da bixwim û dakevim Berîdê pêşî, û piştre ez û herim civînê. Ez nizanim bê çi çêbû ji bo gotina min, ez dixwazim ku îro bigihê min da ez karibim wê belav bikim. Tiştek ji temenê kongreyê nemaya ji bilî sî saetî û hîna tiştekî diyar derbarê dijatiya koledariyê de min nedîtiye. Her tişt tenê hinek sloganên mezin bûn di civîna yekem de û piştre dûrbûn di nêrînan de çêbû û perçebûn derket holê. Herdu şandên îtalî û fransî nêrînên wan baş bûn di temsîla wan de û her dem nerazîbûna xwe didan ji siyaseta welatê xwe... Bi taybetî şanda fransî, tasî û ketwarî çiqas xweş e.

Dema ez çûm Berîdê, bi rê de ez li Marî tot hatim û ji min re got ku cezayirî ji konferansê derketin. Cezayiriyê ku min doh ew nas kir dev ji kongrê berda tevî hinek fransî û ingilîzan, bi sedema ku hevgirtin tune ye û ji bo wê yekê pirtûkek pêşkêş kirin. Wê sibe her tişt li ser vê bigihê deste min. yan jî

wê pirtûk bi xwe bigihê min ku derfet hebe.

Saet bûbû deh û çarîk û hîna civînê destê nekiribû. Ez hinekî ji xwe re meşiyam û min bi 30 draxmî sê wêneyê biranînan ji kongrê re kirin (û bû sedema bobelatek mezin ji min re), sebaret bi min riya vegerê ji min re nemabû.

A sekretêr ji min re teqez kir da ez herim şîvê li mala wê bixwim. Min nizanîbû ezê herim yan na, lê kêfa min gelekî ji tevlihevbûna nava xelkê re nayê.

Ê serok nameyek ji Doktor Kamiran da min. Ji Parîsê şandibû, tê de gavên min pesend kiribû weke temsîlkarek ji miletê kurd.

Saet bû 12 piştî nîvro û hîna civînê destpê nekiribû. Ez dibêm qey wê kongreyek ne serkeftî be, lê ji kurdan re tiştekî baş e. Hema bi kêmanî navê wan kete nava navên dewlet û rêjîmên li dijî koledariyê.

Hîna yê cezayirî li vir e û hemû li ber digerin da wî bigihînin baweriyê... ka em encamê bibînin.

Ez ê aniha nameyekê ji Doktor Kamiran re binivîsînim hîna ku ez li oda xwe me. Min name qedand û ez daketim. Min dît ku di civîna taybet de ragihandin ku ê cezayirî ku navê wî Haşim bû, xwe kişandiye. Wî adresa xwe dabû min û navê partiya xwe. Ingilîz û fransiyan jî piştgiriya wî kirin piştî ku raportekê berfireh bidin û di rojnameyan de belav bikin. Hemû ketibûn hev de û kesekî nedikarîbû biaxiviya. Yonan û her kes xerîk bûn, ez nizanim bê wê encam çi be.

Ez hinekî bi ê cezayirî re sekinîm, xatir ji min xwest, bi zimanê erebî ji min re got: rastî bilind dibe, lê jê bilindtir nabe, û gerek e rastî di dawiyê de diyar bibe, xwe xurt bike, ji ber şansê te ji ê min ne çêtir e.

Sûriyan xwe ji qesta dûrî min dixistin, bi rengekî bê rê û kes ji wan silavê li min nake ji bilî Fatih. Ez jî guh li wan nakim tevî Efleq jî, ji ber ew tiştê ku dikirin bê rê bûn. Lê bi her hal

divê em tehemul bikin, ji ber em lawaz in. Dawiya dawî Xwedê kerîm e.

Ê rojnamevan kerta vexwendinê a mala sekretêr da min. Ez nizanim bê wê encam çi be, lê divê ez wê rewşê tehemûl bikim. Hema rojek din, jê û pê ve ezê azad bibim û ji vê zindanê derkevim. Çi kongreyek ji hevketî. Tu sazumanî tê de tune ye. Her kes ji xwe re tiştekî dibêje. Civîn jî tu carî di dema xwe de li dar nakevin.

Saet yek û nîv ez ji hotêlê derketim. Hingî ez ne li ser hev bûm û min nexwaribû, ne jî vexwaribû. Ez daketim nava bajêr û li basek mezin siwar bûm. Saet pênc vegeriyam lê hîna civînê nû dest pê kiribû.

Wek her car ez di nava yonanan de rûniştim. Min dît dema dengdanê ji Cezayir re navê Kurdistanê nehat gotin. Min dikir dîn bibim û ji qehra canê min lerizî. Lê piştre ez têgihiştim ku ewê bi nav bûne tenê ê ku axivîne, ne ê hazir in, bihna min fireh bû. Civîn di saet şeş û nîv de bi dawî bû. Wê gavê ez çûm ba birêz Horîm da ku pirsa gotina xwe jê bikim. Hema min dît bi destê min girt û bi zimanê fransî ji hinekan re got; va ye Bedirxan nûnera Kurdistanê... Silav li min kir û got: ev du roj in ez li te digerim. Hodjî bi ken bersiv da: mir di nexuyaniyê de dijîn. Min jê re got: na, bi tenê kesê tirsonek xwe diveşêrin.

Ji min re got: tu ne lawaz û tirsonek î. Tu bi tena xwe yî, ku tu wisa baya te ceger nedikir. Û pirsa tiştê li ser sînga min kir, min jê re got: ala Kurdistanê ye. Rabû nexşand û gotinek kurtî ji min xwest, weha got: ezê anîha bişînim rojnama xwe, sibe ezê bêm li te guhdar bikim û ronkirinê ji te bibim. Di wê gavê de a sekretêr hat û ji min xwest ez bersivê rojnameyek yonanî bidim. Ew xanima ku adresa xwe dabû min û mêrê wê pêşrewê Yonanê bû ji min dixwest ku ez sibê bi xanimên yonan re li mala wê saet deh û nîv rûnim. Min vexwendina wê pejirand û bi vegerê re ezê herim ba birêz Hodjî da ez dupat

bikim ji bo çapkirina gotina min bi çi hawî be. Xwend û sererast kir. Ji Marî xwest da wê bi zûtirîn dem çap bike. Wê jî soz da ku sibe ê karê wê yê pêşî be û her sisêyan soz dan min ku we bi min re bin û bi Kurdistanê û rastiyê re bin. Destpêkirin nalet li wan kesên ku derewan dikin, xwe dikin diminê koledariyê û ew bi xwe koledar in kirin. Û wisa Hodjî ji min re got derkeve here bê xem rakeve. Ji ber doza te dozek dadwerî ye wê Xwedê bi te re be. Guh nede kesî!

Ez neçûm vexwendina Ilza ji ber min nedixwest ez xwe nêzikî wan bikim, û divê ez bêjim ku Şerbecî kirî ji hiş biketaya dema gotinên min û rojnamevanê fransî dibihîst.

Emê binêrin bê sibehê çi ji me re veşartiye.

05.11.1957

Piştî ez ji Berîdê derketim iko min nameyek ji Doktor Kamiran re nivisandibû, ez çûm civînê. Civîn baş bû, bi amadebûna nûnerê Mekaryos û nûnerê Ingiltere Mr. Rojoy, ê ku li ser miletê bindest li Asya û Afrîka û Amerîka bi tevahî axivî, doza xebatê kir ji bo şikenandina koledariyê li ser rûwê erdê. Bêyî li wan miletan bê pirsîn, ji ber koledar dibêjin ku ew milet ne heja yî rizgarkirinê û otonomiyê ne. Çepikên xurt lê ketin.

Di dawiya civînê de ji ofîsa çapkirinê bang li min kirin da ez li gotina xwe vegerim û sererast bikim. Min dît ku baş e.

Hîleq nikarîbû rûnişta û di cihê xwe de neditebitî. Hema kêlîkekê tenê di civînê de rûnişt.

Min pereyê hotêlê dane wan, dora 1300 draxmî bû tevî bexşişê. Ez niha hatime hotêla Majistik li Atîna, a ku şeva wê bi 50 draxmî bû. Ezê bê xwarin bimînim. Divê bi tiştê ku bi min re maye karibim li vî bajarî bimînim.

Oda min mîna zindanê bû. Ronahiyê lê nedixist, lê paqij bû. Bi her hal du şevê min bi tenê mane, ezê derbas bikim.

Dema ez ji hotêlê derketim min doza paseporta xwe kir. Wan jî nizanibûn li kû ye. Dibe ku ev ji ten û tût bin. Ka heta êvarî di civîna dawî de a ku mîna bumbeyeke xurt e, ezê doza axaftinê bikim û Xwedê bê erê ezê biaxivim çawa be. Hîna heviyek piçûk di paseportê de heye, ji ber li ba xwediyê hotêlê bû. Ew jî ne li wir bû. Dema ez derketim, ewê binerim bê wê li wir çi belayê bînin serê min.

Saetek bi tenê maye, ezê xwe tê de vehesînim û li gotina xwe vegerim, piştre ezê vegerim civîna kongreyê.

Ez saet çar û pênc deqîqe gihîştim, hîna civînê destpê nekiribû. Ez çûm ofîse, min dît ku kaxet çapkirî ne û hemû tişt amade ye. Keçên yonanan gotin li amadeyan belav kirin, birêz Hodjî ji min germtir bû. Ez bi Hodjî re derbasî ba serok bûm û min jê xwest ku navê min qeyd bike. Wî jî wisa kir û min jê re got ku ez nûnera kurda me.

Gava dema min hat û ez rabûm da ez herim cihê axaftinê. Mamoste birêz Kamil Hemarne bang kir: Kurdistan li kû dikeve? Û kurd kî ne? Min guh lê nekir û meşa xwe domand. Şerbecî bang kir: gotinê wê ne rast in û ew ne vexwendî ye. Min bersiva wî neda, tenê ez beşişim. Ê serok ji ber min bersiv da û got: me şanda kurdî vexwendiye da em gazinê wan bibihîzin û em bi hev re rewşa Rojhilata Navîn derman bikin. Tev Mr. Rojoy berpirsê civînê jî bersiv da: Kurdistan ji kevn de nasraw e û me ingilîzan ew ji hev xist. Piştî wê min pendek kurdî ji wan re got: dunya gulek e wê bihn bike û bide xeynî xwe. Min ji wan pirsî: nêrîna we çi ye aniha? Ez hîna biaxivim yan bes e? Ez gihiştim ser masa xwendinê û herkesî naskir bê kurd kî ne.

Mamoste Efleq destê xwe nîşan kir da ez bixwînim û bi tena xwe ji min re li çepkan da. Ê din serê xwe dihejînin, nîşana nerazîbûna xwe didin. Min dest bi gotinê kir. Ez di nava du hokanan de bûm; hokana qehrê û a serkeftinê... Dawiyê a serkeftinê bi ser ket.

Ê berpirs çend caran li zengil da, da tûnisî û misrî yên bi rêza cezayiriyan re bêdeng bin û dema min gotina xwe dixwend, carê min li dora xwe dinêrî da ez bibînim bê rewş çawa ye. Rojnamevanên fransî û ingilîzî kelxweş bûn. Dema ez di gotina xwe de giham ser Yekîtiya Sovyêt min nedît ku made Mr. Ridjoy qulipî, ji ber li ba wî giyanê koledariyê zora e demok

ratiyê biribû û got: xanim, dema te qediya!

Min berdewam kir, wî jî gotina xwe dubare kir, min jê re got: ev pênc roj in hûn diaxivin û ez bêdeng im, de ez biaxivim û hûn ji guhdarî bikin. Û min gotina xwe berdewam kir. Yonanî ji bizava serokê civînê aciz bûn û dema min gotina xwe qedand, çepik di holê de bilind bûn.

Ez vegeriyam cihê xwe û gelekan pîrozbahiya min kirin. Dengê yonaniyan bilind bû, bi taybetî dema avokatekî got:

Hûn çiqas bixwazin gotinê xweş bikin, lê hûn dîsa jî koledar in!

Bi dû min de, sekretêr Ilza axivî û serokê şanda qubrisî civîn bi dawî kir û wisa karê kongreyê bi dawî hat.

Ez kêfxweş ji civînê derketim, ji ber min zora wan bir û ez çûm da ez xatir ji hevalên xwe yê yonanî bixwazim. Hemû min pîroz dikin li ser sekeftina min. Hodji got: min bawer nedikir tu gotina xwe bixwînî, ji ber ez bi xwe li ser bizava wan hazir bûm. Bi her hal bijî ji te re û tu bi xêrê hatiyî!

Min balyoz Hekîm dît û ez nizanim bê navê wî ê pêşî çi bû. Li keleka wî qeşak hebû (Xorî) bi zimanê erebi diaxivî. Serkeftin ji min û Kurdistanê re xwest, Balyozxan got: ê min nêrîna min ne wek a wan e, gurkirina pirsa kurdi li Sûriye serkeftinek e ji Sûriye re û bizaveke xurt a Sûriye lawaz dike. Mixabin di destpêka şer de amade nebûbû. Dema ez pê re axivîm, got: guh li gotinên vala meke, nîşanek besî kese aqilmend e. Û dewam kir: ez bihêzbûna te xerîb nabînim û ez ji xelkê teva bêtir li ser Bedirxaniyan û kurdan dizanim.

Lê mesela paseportê, Muzher Elşerbecî Hindi li cem xwe hiştibû da min pê bêhtir aciz bike. Û dema ez çûm hotêlê ez li paseportê bipirsim, min ji xwediyê hotêlê re got: ecem nîne ku wisa bûbe, ji ber balyozxane mecbûr e kaseke bide min da ez pê vegerim Sûriye û li wir ez Sûriyan bikenim. Şerbecî amade bû, ji cem me çû û piştî demekê kurt vegeriya da ji min

re bêje: Rewşen xanim paseporta te ji doh de bi min re ye. Ez keniyam û min jê re got: xem nîne ku ji te re lazim be bila li ba te be. Rûwê wî tirş bû û got: na, wan da min. Min got: erê, tu jî xwediya wê nas nakî, ji ber wê te li ba xwe hişt, yan jî te li ba xwe hişt da tu pê kurdan kêm bikî. Da min û tew bersiv neda, lê çû û diricîfi.

Rûdawên kongreyê bi tevahî ev in û besî me ye. Em bi serketin û me nûneriya kurdan kir. Me yonanî û ewrûpiyên din kirin dostê xwe.

Sibe ezê li mala jinek yonanî bim a ku di warê pirsa jinê de kar dike, da di riya wê re hinek jin û xanimên yonanî nas bikim û gotinekê ji min bistînin.

Ez saet heft û nîv vegeriyam. Cara yekem ku ez bi birçîbûnek xurt hest dibim, û cara yekem bû jî li Yonanê ez derbasî xwaringehekê dibim. Min du sê sênî bi xweşî xwarin.

Ez vegeriyam hotêlê, min dixwest ez herim sînema, lê ez li ser perê bi xwe re ditirsiyam, nalet li peran be!*

* Rewşen Bedirxan, xatirayê xwe bi zimanê erebî nivîsandine. www.demoqrati.com ew wergerandine kurdî.



Lubnan 1948, Rewşen Bedirxan li havîngeha bi Cemşîd û Sînemxan re



ÇEND NIVÎS



Sînemxan û Cemşîd, 1942

Kebanî û mamoste

Xwendevanên ko çavên xwe li sernameyên vê bend û vê stûnê bigerînin heye ko berî ewilî bibêjin. gelo di ve stûnê de ji me re qala dirûtin û aşbazıyê wê bikin. Ji ber ko bi adetî di van stûnan de qala van tiştan dikin. Ji milê din wê lê ecêbmayî bimînin û ji xwe bipirsin; kebanî û mamoste bi çi awayî gihane hev û ji bona çi?

Lê heke wan sebr bi xwe da û bi nivîsara min ve çûn û ew xwendin ewê bibînin ko heq di destê min de ye û divêt kebanî û mamoste bigehin hev û di her kebaniya kurdmanc de mamosteyek hebe.

Bê şik, wezîfa jinan a pêşîn diyatî û kebanîtî ye. Ji bo jinan ji van pêştir tu wezîfe nîne û her kar û wezîfe di pey wan re têt. Lê gava mirov bala xwe dide û tesîra jinan li ser jiyîna miletan a civakî derpêş dike dibîne ko jin rasterê û nerasterê û bi awayên têvel li jiyîna miletan kar dikin. Ji lewre jinan ji wezîfeyên xwe ên eslî pê ve wezîfeyine din ên mihim hene.

Mêrên ko qedera miletan di destên xwe de digirin li ber

destên jinan bi xwedî dibin, terbiya xwe a pêşîn ji wan digirin û tiştên ko di zarotiya xwe de dielimin heta axa gorinan ji bîr nakin û ew tim û tim li wan hikim dikin. Ji lewre medhelokê gotiye: "Kurmê şîrî heta pîrî."

Ji me jinên kurdmancan re ji van pê ve wezîfeke din jî heye. Ew wezîfe ji rewşa miletê me a xweser dizê. Ji lewre, jin û diyên kurdmancan berê xwe didim we, ji we bi tenê re dibêjim.

Xwehên min ên delal, herwekî hon jî dizanin derdê miletê me ê mezin û xedar nezanî ye. Nezanî nexweşiyek e, û dermanê wê zanîn e. Nik miletên xudan hikûmet û teşkîlat vê nexweşiye di xestexaneyine xisûsî de derman dikin û ji wan xestexanan re dibistan dibêjin. Mamoste, bijîşkên wê xestexaneyê ne.

Miletê me, ne xwediyê wan xestexanan e. Miletê me miletekî belawela ye û di bin hikmê miletine din, miletine dijmin de ye. Lê dijminê me ê mezin, ê meztir nezanî ye. Divêt em şere wî dijminê xedar bikin. Di vî şerî de jî ji me jinên kurdmanc re divêt ko arîkariya mêrên xwe bikin, zaroyên xwe bielimînin xwendin û nivîsandinê û wan ji nexweşiya nezaniyê xelas bikin.

Rewşen Bedirxan
Hawar
Hejmar: 27
15.04.1941

Jin û bextiyariya malê

Gelek jin hene; bawer dikin ko rehetî û xweşiya malê bi pere û dewlemendiyê ye. Lê ne we ye. Seadet û bextiyarî ne ji dewlemendan bi tenê re ye. Xincikên belengazan hene ko seadet û bextiyarî, ji qesra dewlemenda çêtir û bêtir, tê de qerar digirin û bi rehetî cih dibin.

Carina seadet sadegiye û bextiyarî pê rewşen û geş dibe. Sadegiya xwediya malê ew e ko bi xelkê dora xwe re mihirvan û dilovan bibe, piçûkan neêşîne, bi mezinan re ji adetê der midareyê neke. Bi van wesfan xwediya malê dikare hejkirina xelkê xwe, çi kiçik, çi mezin, ber bi xwe ve bikişîne û bibe perestiya wan.

Gelek tiştên bêehemiyet hene ko carina jin li ser wan disekinin û bi stûriyê pergara mala xwe xerab dikin. Ji xwe erin her tiştî tevlî hev dike û tamsariyê dixe hêlîna seadetê. Ji jinan re divêt ji mêran bisebirtir bibin û gava mêr dixeyidin ew sebirê bi xwe bidin.

Erin agirek e, ji bo vekuştina wî, jê re av divêtin, jê re hêni-

kahî gerek e, ne agirekî din. Ber vê yekê gava mêr germ dibin divêt jin honik bibin û wê germiyê şîrgerm bikin.

Rewşen Bedirxan
Hawar
Hejmar: 28
15.05.1941

Derfeta raman

Dibe ku mirov rastî hinek bûyeran bibe û ji bo demeke kurt şepirze bibe û bi wê kerbê ji jiyanê û ewên têda dijîn vebe û bawerî bi akar û bihayan nemîne heya wî astî ku bibe kesekî reşbîn û hemû rewş û tîtal û resendariyê ji bîr bike.

Reng e ev şepirzeyî domdar be û verêjên xerab hebe kontrola rê û hiş bike û mejî bişewitîne û canê mirov biperitîne. Kêm caran dibînîn kesek di nava wê qerqeşeya gûhnedanê da bikare windabûna xwe bibîne û ji nû ve des pê bike.. Ne li ber xatira xelk û civakê, lê ji ber wan rojên jiyê wî yên mayî û neçare biborîne û eve jî civak li ser wî sepandiye û ne ew bi ser civakî da bisepîne.

Bêguman ev herişîna riha wî li vi warî da berejengên tehl û dijwar li dû xwe da cîh dihêle û bandora wê dê li ser tendurustî û mejiyê wî da hebe, tenê bo wî kesê nebe ku dixwaze bijît bêyî ku bibe bargiranî li ser dendona xwe û hewl dide ji nû ve bişkurînê li ser lêvên xwe yên berhtî wêne bike û dûr be ji gazin û êşan.

Gava mirov dikeve di nav arîşên jiyanê de, bi wî rengî vedizivire derûnê xwe û xwe nas dike û her kesek xwe binase û xwe ezmûn bike, ewê samaneka caniya mezin bi dest xwe ve bixe.

Bûyerek bi ser hevaleke min de çêbu û kete welatekî hawîrdor û şarezayiya wê li gor rêk û taxên wî welatî bi qasî şarezayiya min a derbarê zimanê çînî û hinek li cihê manewiya xwe dûr bû û ji ber her sedemekê daxwaz ji jinekê kir ku wê bigehîne cihê xwe û li gorî pêzanîna xwe ji bo şofêr şirove kir. Welê dema ev kar ji bo şofêr têkel û pêkel bû û li rêkê winda bû. Dîsa jî delîve li hemberî hevala min nema ku bi ser cihê xwe hel bibe û li şofêr tûre bû ku dixwest xwediya tirembêlê bi awayekî normal û bi axaftinekê wê hêmin bike. Welê ev tişt nekir û hevala min bi neçarî ji tirembêlê hate xwar heta ku yê din tûşî tûrebûnê neke û got eger bi rêveçûn be, dê bikare rêkê bibîne û hemû jî razî bûn. Em dikarin bibêjin ku bi vî awayî ji wê bargirê ketibû li ser stûyê wan rizgar bûn û bi rastî jî ji bo demê deh xulekan bi piyan bi rêveçû û gîha cihê wê dixwest bêyî ku kesek pişteyaniya wê bike.

Bêguman gehîşt û volkaneka tûreyiyê bû, em dikarin bibêjin bi bêzarî û bêzve welê dema wê cixareyek keşa û dûkêla wê ber bi asîman şand û dilê wê bi wan kesan şewitî ku di raman û bi wiya yê jiyanê tênagehin û ji wê şepirzeyiyê derbas bû ku wê başiyên xwedê bi bîra xwe anî... Wê demê hemû westan û tengasiyên jiyanê ji bîr kir û kenê xwe lê kir.

Rewşen Bedirxan
El Teaxî
03.071971
Hejmar: 774



HEVPEYVÎN



Beyrûd, 1952.
Cemşîd, Rewşen Bedirxan, Sînemxan[illegible]0 hevala Sînemxan Wefa

Li mala Rewşen Bedirxan

Piştî rêwîtiyeke dirêj, ez berdestê êvarê, li Baniasê, ji otobusê peya bûm. Banias bajarekî xweş e, bi a min yek ji bajarên Sûriyê yê herî xweş e. Bajar li kêleka deryayê hatiye avakirin. Bi awira pêşî piraniya bajarvaniyan dewlemend dixuyin. Dibe ku jî mirov dewlemendiya wan di lixwekirin û otomobîlên wan de dibîne. Herçiqas rûnîştevanên bajêr ereb jî bin, dîsan mirov peyayên bi çefî û egal û jinên sernuxumandî kêm dibîne. Li vî bajarê Sûriyê yê nûjen, xanimeke kurd dima. Keça Salih Begê, dotmam û kevaniya Celadet Begê... Kaxeza navnîşana vê Xatûna han di destê min de bû û yên ku ez pêrgî wan dibûm, min navnîşana wê ji wan dipirsî. Gotineke pêşiyên me heye, dibêje "Mirov bi pirsê dihere Xursê." Ez jî bi pirsê gihîştim ber avahiyekê, hebekî li ber deriyê avahiyê rawestiyam û min hêdî bi heyecan li derî da. Ya ku ji min re derî vekir berdestka wê bû. Jinikê bi tirkiyeke osmanî, lê bi devoka çerkezan bixêrhatinî da min, çenteyê min ji destê min girt û ez birim odeya rûniştinê, ba Rewşen Xanimê. Rewşen Xanimê

jî bi mêvanperweriyeke kurdi û bi rûyekî bi ken bixêrhatinî da min û ez bi cih kirim.

Ez jî bi dilşahî rûniştim. Piştî kurtesohbetekê min çavên xwe li resimên li dîwêr gerandin. Resimên ku pêşî li ber çavên min ketin, resimên hersê biran; Sureya, Celadet û Kamiran Bedirxan bûn.

Piştî şîvê min ji Rewşen Xanimê pirsî:

Gelo tu ê bikaribî bi niyeta kurtehevpeyvînekê xwe bidî naskirin?

- Ez keça Salih Bedirxan û jina Celadet Alî Bedirxan im, got û jê pê ve tu tişt negot.

Ji xwe bes e jî. Kurdên ku navên Salih û Celadet Bedirxan nebihîstibin pir kêm in. An jî kurdên xwende û bîrewer yên ku haya wan ji Celadet û xebatên wî tunebin, çi bigire nîn in.

Ê baş e, xebat û xwendina Rewşen Xanimê bi xwe çi ye û çi bû?

- Weke kar, min mamostetiya zimanê erebî dikir û ez demekê jî midûrê dibistanê bûm. Erebiya min ji kurdî û tirkiya min çêtir bû û çêtir e jî. Ji ber vê yekê xebatên min yên rewşenbîrî jî bêtir bi zimanê erebî dibû. Min bêtir bi erebî dinivîsand û ji zimanên din werdigerande erebî. Min pirtûkek jî bi navê "*Hin Rûpel Ji Edebiyata Kurdî*" bi erebî, berpeyî xwendevanên ereb kiriye. Min carina jî hin bend di *Hawarê* de belav dikirin.

Gava ew bi kurdî dipeyivî wê hin zehmetî dikişand, ew carina di nav re bi min re bi tirkî dipeyivî; bi tirkiyeke pir xweş û bê kêmasî...

- Niha jî ez vê pirtûka han werdigerînim erebî (Pirtûkek li ser Siltan Evdilhehemîd bû).



Firat Cewerî, li mala Rewşen Bedirxan, Banias, 1987

Ji bo çi ev pirtûk û ne yeka din?

- Weşanxaneyekê ev ji min xwestiye, bêtir vê **bala wan kişandiye**. Tu ya rastî bixwazî, bi wergerandina vê **pirtûkê çend** quruş pere jî digihîjin destên min.

Bivê nevê sohbeta me carina diçû dema rehmetî Celadet Beg û kovara Hawarê.

Yadê, tu dikarî ji kerema xwe re bi kurtî behsa dema Hawarê bikî? Hawar li ku û çawan derdiket, yên zîrek ku tê de kar dikirin kî bûn?

- Çapxaneya Hawarê li malê bû. Yek ji mijûliyên rehmetî yê sereke derxistina *Hawarê* bû. Min jî alîkariya wî dikir. Piştî demekê, gava ez hînî rêzkirin û ambelajê bûm, kar hêsantir bû. Hingî Osman Sebrî û Qedrîcan jî li ba me diman, herdu jî pir jêhatî bûn. Dû re Îbrahîm hebû, ew bi rastî jî rewşenbîr bû. Osman Sebrî çar mehan li cem me mabû, hîn jî min nizanibû

ku ew Osman Sebrî ye. Wan Osman Sebrî, bi Hecî Husên bi min dabûne naskirin.

Hin kes dibêjin ku kovara Hawarê bi alîkariya fransizan derdiket, ma rast e?

- Na, ne rast e. *Hawar* ne bi alîkariya fransizan, lê bi destûra wan derdiket. Ne bi tenê *Hawar*, her wisa *Roja Nû* jî bi destûra wan derdiket.

Heke îro fransiz li vir bûna, wê rewşa kurdan çawan bûya?

- Wê rewşa kurdan her wilo bûya. Fransiz jî kolonyalîst in û yen ku em îro di bin destên wan jî de ne kolonyalîst in.

Ma rast e ku armanca Celadet Beg avakirina Kurdistaneke monarşî bû?

- Kî vê bibêjin ew bêbextiya li rehmetî dikin. Wî tu carî tiştekî wilo ne gotiye, ne jî daxwaz kiriye. Wî her digot, divê Kurdistan bi destên hemû kurdan bête ava kirin. Çi karker, çi gundî, çi mele, çi axa û beg hemû xwediyên Kurdistanê ne. Armanca rehmetî Kurdistaneke demokratîk û yekbûyî bû. Ji xwe Kurdistan yek e. A niha jî hin xort dibêjin em ji Kurdistana Tirkiyê, hin dibêjin em ji Kurdistana Îranê, hin dibêjin em ji Kurdistana Iraqê û hin jî dibêjin em ji Kurdistana Sûriyê ne. Bi a min ev ne rast e, şaş e. Kurdistan yek e û sînorên ku li Kurdistanê hatine kişandin ji derveyî îrada kurdan hatine kişandin. Ew sînoren emperyalizmê ne.

Ew Celadetê ku îro ji aliyê hemû kurdan ve tête hezkirin, gelo ji Rewşen Xanimê re çawan bû?

- Ew ne bi tenê mêrê min, lê ew her tişte min bû. Ew bavê min, birayê min, hevalê min, mamoste yê min bû. Ez jî yek ji wan kurda me ku îro kêmasiya tunebûna wî dihîs mim.

Windabûna vî peyayê bi rûmet çi tesîr li jiyana te kir, ev trajedî çawan çê bû?

- Mirina wî ez mehû kirim, dinya bi ser min de hilweşand. Mesûliyeteke siyasî, civakî û aborî di stûyê min de hişt. Li xwe dawîhatina jiyana wî ya bi trajedî jî, ji bo başkirin û hebekî bipêşdexistina aboriya xwe bû. Lê nebû, ew kar bû sedema mirina wî.

Çi bû ya ku bû sedema mirina wî?

- Tacirî, pembo... Em gelekî destteng bûbûn. Ji ber ve yeke rehmetî rabû zeviyên hevalekî xwe bi nîvî çand, kire pembo. Ji ber kêmbûna avê, wî dest bi kolandina bîrekê kir û navê bira xwe jî kire "Bîra Qederê". Ew di wê bîra xwe wer bû û mir. Wî bîra xwe bi destê xwe kola.

Piştî van gotinan Rewşen Xanimê demekê bêdeng ma, kûr kûr fikirî û cigarek vêxist. Wilo xuya bû ku we hê jî ew bûyer ji bîr nekiribû. Min jî nexwest ez zêde bi dû sedemên ku çima "wî bîra xwe bi destên xwe kola" bikevim, min gotin dagerand ser tiştekî din:

Çi ji xortên kurd yên li Ewrûpayê dikeve serê te? Ew dikarin çi bikin?

- Ger ew bibin yek, ew dikarin her tiştî bikin. Yekîtî! Divê hûn yekîtiyekê di nava xwe de çêbikin. A niha bi dehan kovar û rojname derdikevin, çira? Ma ger hûn werin ba hev û sê–çar kovar û rojnameyên bi kalîte derxin, ne çêtir e?

Heya ku ez li ba we bûm, wê ji min re got, got û got. Destê min ji vê mirova gotinxweş, zarşêrîn, zana û rewşenbîr nedibû. Di mêvandariyeke kurt de we ez hînî pir tiştan kirim, dîrokek ji min re got...

Firat Cewerî

Bamas, bihara 1987an



Rewşen Bedirxan



JI BO BÎRANÎNA
REWŞEN BEDIRXAN



Rewşen Bedirxan

Şahjin Rewşen Bedirxan (1412-1327=1909-1992)

Şahjin Rewşen Saleh kurê Mehmûd kurê Saleh Bedirxan: torevan û mamosta, jina dumahiyê ya ji malbata Bedirxaniyan ku bi zimanê Bedirxaniyan biaxive. Hevjîna Mîr Celadet Bedirxan û dotmam û destê rastê yê wî ye.

Li bajarê Qeyserî yê Tirkiyê ji dayik bûye û bavê wê ji bo wir hatibû dûrxistin û ji dayik û bavekî Bedirxanî ye, ji aliyekî bavê wê Saleh Mehmûd Saleh e, Salihê dawiyê ku birayê Bedirxan ê mezin e. Dayika wê jî Samiye Bedrî paşayê birayê Bedirxan ê mezin e.

Şahjin Rewşen Bedirxan çar salên zaroktiya xwe li Stenbolê jiyaye û li sala 1913 ji nû ve tirkan Bedirxanî ji bo deverên cuda yên Rojhilata Navîn dûr xistin. Hingê bi neçarî di gel bavê xwe Sâleh Bedirxan û mamên xwe weke Yusif Bedirxan li Dîmeşqê (Şamê) nîştecî bûye. Xwendina xwe li Xaneya Mamostayan li Dîmeşqê bi dawî aniye û li nava keçên wê serdemê, li Suriyê ji mamosteyên destpêkê bûye.



Salih Bedirxan, bavê Rewşen Xanim

Eve û demekê li Urdinê 1924-1927 bi karê fêrkirinê rabûye û piştî hingê hatiye Dîmeşqe û li dibistana Elîbek ya fransî li hemû polên keçan waneya zimanê erebî gotiye. Li sala 1929 weke mamoste li dibistanên hikûmî hatiye damezrandin û li sala 1934ê erkê bi rêvebirina kargêriya qutabxaneya hikûmî bi stuyê xwe ve girtiye.

Tevlî komeleya derçûyên Xaneya Mamostayan bûye û li sala 1944 tevlî Yekîtiya Afretan bû, çend mehan bi karê fêrkirinê rabûye û piştî zivirîna wê li kongreya afretan jî wê yekîtiyê veqetiya ku dumahiya sala 1944 li Qahîre hatiye girêdan.

Li sala 935ê şu bi Mîr Celadetî kir û hevdê alan bi hev re jiyan û piştî hîngî Mîr Celadet çû ber dilovaniya Xwedê û piştî oxira Mîr Celadetî xem û jan li wê kombûn û bûwe nêçîra

westiyan û tengasiyan, welê zêdebarî vê yekê ji xwe radestî tengaviyên jiyanê nekir û giraniya jiyanê wê newestand.

Li sala 1957 bi nûnertiya gelê xwe yê kurd çuye Yunanistanê û di kongreya Antî Kolonyalîzm beşdar bû û ji bilî wê çi kurdek li wê derê nebû, welê karî berheviya xwe tê de îspat bike û serincan ji bo xwe rabikêşe.

Li sala 1971 li ser daxwaza rêberê şoreşa kurdî ber bi Iraqê ve çû li Hac Umran Yekîtiya Afretên Kurd damezrand û ji bilî zimanê xwe yê dayikê zimanên tirkî û crebî dizanî û şehrezayî di her du zimanên fransî û ingilîzî jî de hebû.

Tiştê jê dihate nasîn ew e ku keseke diyar bûye di warê wergêrana kurdî û tirkiyê ji bo erebiyê, eve zêdebarî nivîsînê û her wisa jî li radyoya Dîmeşqê li sala 1947ê kar kiriye li koşeya "Axaftinên Zarokan" da.. Dîsa jî wê çend wane û çîrok li rojname û kovaran de weşandiye.

Li roja dûşem 1ê Hezîranê li mala xwe da li bajarê Banyasê li ser kenarê çûye ber dilovaniya Xwedê û li kêleka hevjîna xwe Celadet Bedirxan û bapîrê wê Bedirxanî li goristana Şêx Xalid Neqşebendî li Taxa Kurdan li bajarê Dîmeşqê hate veşartin.

Eve jî lîsteke bi navê pirtûkên wê yên wergêrayî û nivîsandî: "*Bîranînên Mamostayekê*" li sê pişkan, ji nivîsîna Reşad Beg Nûrî 1954. "*Evîn û Janên Min*" ji nivîsa Mukerem Kamil li sala 1953 hatiye çap kirin. "*Nameya Gelê Kurd*" ya helbestvan Goran ku li sala 1954 hatiye li çapdan. "*Çend Berperek ji Tora Kurdî*" li sala 1954 hatiye çap kirin. "*Nameyek ji bo Mistefa Kemal Paşa*" ya Mîr Celadet Bedirxan li sala 1991 çap buye. "*Ya daştên Min: Saleh Bedirxan*" li sala 1991 hatiye çap kirin.

"*Bîranînên Jinekê*" li sala 1951 hatiye çap kirin (danana wê ye). "*Kosmopolîtiye*", danana Mehmûd Hesen Şinuyî, wergeran e. "*Bêyî Dîrok*" û eve jî bilî karên di yên cuda cuda ku ji bo çapkirinê berhev bûn weki "*Celadet Bedirxan Weki Min*

Nasî" danana wê. "*Selemên Rastiya Şikestina Edirne*" wergêran, "*Yadaştên Rewşen Bedirxan*", "*Mîr Bedirxan*" danerê wê Lutfî (wergêrana wê).

Mamosta Îzeddin Melayî got: "Li dûmahiya jiyê wê min weke rêveberê dibistana Leyla Exîliye li taxa Salihiye min nasî, ew jineka polayî bû û bi rêvebirineka serketî û bîrmendeka hizr rewan."

Ansiklopedia Ragihandina Sûriyê



Amman, 1991.
Rewşen Bedirxan li gel neviya Sureya Beg Nafiya, jina Kurmanc Nebîl û Wefa Nabulsî

Rewşen Bedirxan

Li 11ê Tîrmeha 1909ê ji dayik bûye, keça Salih Bedirxan e. Rêvebira Xwendingeha Leyla Exîlî ye. Jina Celadet Bedirxan e ku bandoreke baş li ser wê hebûye heta ku mîna wergerek bikare li warê zanistî û kirdarî ve gavên baş biavêje.

Her ji sala 1924 ve heta 1927ê rêvebera dibistaneke hikûmî bûye li bajarê Kerek li rojhilata Urdinê, piştî hingê hatiye Dîmeşqê (Şamê) û saleke xwendinê li dibistana Elayîk ya fransî kar kiriye û li hemû polên şaxê keçan de mamosteya zimanê erebî bûye.

Li 9ê Nîsana 1929ê wekî mamoste li dibistana hikûmî li Dîmeşqê hatiye damezrandin heta destpêka sala 1924-1925ê ku bi rêvebirina dibistanê bi wê ve hatiye spartin.

Tevlî komeleya Yekîtiya Afretan bûye li sala 1934ê, piştî vegerîna wê li kongreya jinan ya ku li Qahîrê hatiye li darxistin li dumahiya sala 1945an veqetiyaye.

Li sala 1951ê du çirok ji zimanê tirkî wergerandiye, ya ye-



Rewşen Bedirxan, li gel mamosteyan, Şam.

kem bi navê "*Bîranînên Jinekê*" hatiye çap kirin û ya dûyê jî bi navê "*Evîn û Janên Min*" hatiye çap kirin û wê hinek pirtûkên neçapkirî hene ji wana "*Bîranînên Jinekê*" û "*Rêka Dil*".

Her wiha wê "*Çend Berperek Ji Tora Kurdî*" heye Beyrut, Çapxana Simiya, 70 rûpelên biçûk.

Hinek semînar û çîrok hene ku li radyo û rojnameyan de hatîne weşandin û çap bûne.

Li sala 1947ê li radyoyê çend mehan li beşa zarokan de kar kiriye.

Marwan Misrî
Mihemed Eli Welanî
Ji kitêba *Nivîskarên Jinên Suriyê 1893-1987*

Dema Xanimē barkir

Ji behiştiya zērîn ji Rewşen Bedirxan re pêşkeş e

Bedirxan Sindî

Xanima ēş û zēmaran, xatîna derdē giran
Şehzada eşqa welatî, rewşemala Bedirxan
Zêrîna perēn Hawarē, tîroja peyvēn zelal
Rewşena mîrē ûmēdan, gewhera tacē seran

Hevala mîrē xebatan, hevjiya Celadetî
Tu li ber ava kovanan, şengebî buy neketî
Xanedana binemalan, evro şînî bo te ye
Şîniya cerg ü dilan e, dilbera vî milletî

Ruh şîrînē xanimē, ger bi esmanan tu ketî
Xoş silavan bigehîne, sernivîsvanē padşeyî
Tu ji mîrē peyva bēje, hēşta geşdar e mîro
Hawara te xoş veda, xoş nivişta zēr xetî

Xanima ēş û zēmaran, xatîna derdē giran
Şehzada eşqa welatî, rewşemala Bedirxan
Zêrîna perēn Hawarē, tîroja peyvēn zelal
Rewşena mîrē ûmēdan, gewhera tacē seran

Ger gehiştî rex û dorēn sernivîsvanē behiştî
Tu veke jē ra dilē me, bibînit zūxa piriştî
Jē ra bējî xanima min, ew ûmēda wî ji mējan
Girtiye evro xunavek, leyleka dura perestî

Em li ser lûka Mîr ne û kurdî her barê me ye
Êke kurdî û her dimmî, ekzimanî karê me ye
Me ji bil kurmanc nîne û em bi kurdî dipeyivîn
Me ji ferhenga xebat e û kurdî her zarê me ye

Xanima eşqa ümedan rewşena deşt û çiya
Têhniya ava silavan neviya mîrên kîviya
Oxira te ya xêre bit, xatîna koçka xebatan
Şahjin û Mîr û Xatînî, serfîraza hemî diya

Xanima êş û zêmaran, xatîna derdê giran
Şehzada eşqa welatî, rewşemala Bedirxan
Zêrîna perên Hawarê, tîroja peyvên zelal
Rewşena mîrê ümedan, gewhera tacê seran

Ez dizanim dê tu bimînî, li behîşta pir gulî
Bêkes û Goran û Hacî û Xaniyê ezman şîrîn
Kamiran, Qedrîcan, Esîrî û Cegerxwîn
Huzur û Botî û Osman di hewarê de dibistrî

Tu bike li wan silavan, bibe gel xo xoş gulavan
Torevanên mi re dostbûn, sutiyê di cerg û hunavan
Sotiyêt kurdîniyê ew bûn, xudanê ferhenga êkbûn
Ew ji hawarê re raper bûn, berhemê wê wan ji ber bûn

Ey xudana soz jaran, dergehê koçka siyaran
Sal bi salan te mîhvaran, hewandîne ber xebatan
Me bi destê te pîroz e, xanima ser xanedan
Milletê me pir ji bîr e, zaroyên te şîr helalan

Xanima êş û zêmaran, xatîna derdê giran
Şehzada eşqa welatî, rewşemala Bedirxan
Zêrîna perên Hawarê, tîroja peyvên zelal
Rewşena mîrê ûmêdan, gewhera tacê seran*

* Ev helbest li roja 03.06.1992an de li roja hêşkirina şahjina kurd Rewşen Bedirxan de, ji hêla Bedirxan Sindî ve hatiye nivîsandin û bi dengê wî li Radyoya Kurdî ya Komara Iraqê (Hewlêr) de hatiye belavkirin.



Rewşen Bedirxan li gel Selah Mihemed Elî Ewni, 1953

Çend wêstgehên geş li ser jiyana Rewşen Bedirxan

Ji ber pisporiyê û li destpêka jiyana min ya zanistî delîve ji bo min çêbû ku ji nêzîk ve ez haydarî girîngtirîn berperên têkoşîna pîroz a Bedirxaniyan bibim. Ji pêxemtî pirsa neteweya wan, ku rengvedanên eşkere li ser gelek ji nivîsîn û pirtûk û nameyên min ên zanîngehî hebû. Dema sekreterê giştî û endamekî çeleng bûm li Korî Zanyarî Kurd her li sala 1970 derfet bo min hatine pêş serdana gelek welatên erebî û ewrûpî jî bikim. Di nav wan da Dîmeşq paytexta Sûriyê jî hebû û wî çaxî ji bo cara yekem min xatûna mezin Rewşen Bedirxan dît û nimûneyeka bilind û bê bevil bû li hemî biyavekî de?.. Li kesatiya wê ya serketî û hêza axaftinên wê û hesta wê ya neteweyî.

Her di vê boneyê da min divêt amajê bi wê yekê bikim ku wê hejmareka zêde ya berhemên Bedirxaniyan pêşkêşî pirtûkxaneya Korî Zanyarî Kurd kir ku weke mirariyan bûn, nexasime hejmarên hinek kovaran ku kêm dikevinc berdestan bi zi-

manê erebî û kurdî. Li gor ye çendê kovara Kori Zanyarî û rojnamevaniya Iraqê bêtir ji carekê li ser rawestiya. Bê şik ji ber vê sedemê û sedemen din jî mafê Rewşen Bedirxanê ye bibête mijara nameya doktorayê.

Ew li gelek kongreyên cîhanî de beşdar bûye wekî kongreya berengariya dagirkariyê ku li sala 1957ê li Atîna ya paytexta Yonanê hatibû li darxistin. Li van kongreyan da wê çalakiyên berbiçav hebû li gor hişyarkirina rewşa neteweya xwe.

Bi rastî ji xatûna Rewşen Bedirxan agirekî geş e li ser serê çiyayên Kurdistanê.

Kemal Mezher Ehmed
Bexda
22 Nîsan 2009

Bi navê Xwedayê mezin û dilovan
Korî Zanyarî Kurd
Wezaret - Bexda
49 29.06.1971

Belgename

Bi vê nivîsê em piştevaniyê didin, ku Rewşen Saleh Bedirxan endama piştevanê Doktora Zanyariyê Kurd û daxwazê dikin ku razîbûnê li gorî dûvçûnên wê bihête kirin ji bo hêsankariya erkên wê yên zanistî.

Îhsan Şêrzad
Serokê Korê

Bi navê Xwedayê mezin û dilovan

Korî Zanyarî Kurd
Wezîrtî - Bexda
Hejmar 27
Roj: 05/01/1972

Xatûna rêzdar Rewşen Bedirxan

Spasiya we zehmetiya we mezaxtî dikin ji bo bicîhkirina wê erka bi we hate spartin bo komkirina pirtûk û destnivîsan ji bo Korê li Tirkiye û heta niha du bestek bi rêka balyozxaneya Iraqê li Enqerê gihîştine.

Em dixwazin we haydar bikin ku Dr. Kemal Mezher Ehmed Sekreterê Giştî yê Korê li nîvê wê mehê ê ber bi Qahîre û paşê Beyrut û Dîmeşqê ve biçe û dê li dumahiya vê mehê û destpêka meha paşarojê bigihe wir û hêvîxwaz in berî gihîştina wî, yên pêdivî bêne cîbicîkirin ji bo merema wergirtina pirtûkxana mamostaye mezin Memduh Selîm û hêsankariya vegûhestina wê bo Bexdayê.

Hêvîdar in silavên me yên germ bigihînine mamosta Memduh û rêz û spasiyên me qebul bikin.

Îhsan Şerzad
Serokê Korê



Yekîtiya Afretên Kurdistanê

Hejmar 127
Desteya Kargêriya Bilind Betaw.n
Roj: 06.06.1972
Caddeya Ebî Newas

Ji bo xwişka mezin a xebatkar Rewşen Bedirxan

Spas û rêz
Silavên germ
Bextewer im ku bi navê xwe û keçên te yên Endamên Desteya Kargêriya Bilind a Yekîtiyê serbilindî û rêzên xwe pêşkeşî we bikin ji bo wê rola serekî ya mezin ku we ji bo serxistina kongreya sêyê ya Yekîtiya Afretên Kurdistanê cîbicî kir û di rastiyê de ew berhem e yaku we ji bo demên dirêj tê de kar kir ji bo çandin û sexbêrîkirina dare we bi dirêjahiya jiyana we ya pirî xebat û qurbanîdan beyî ku berjewendiya xwe li ber çav



bigirin. Hûn hergav temet kûratiya dili u binaniya çav û gûhdanê li me dûr bûn û hun rêberek bûn ku li warê xebata afretên Kurdistanê li pey şopa te biçin û em bi mezinî ve li rêbera me ya mezin dinihêrin ku hewlên xwe di demê girêdana kongreyê da mezaxt û hemî dem û saxlemî û bêhnvedana xwe pêxemetî berjewendiya gelê xwe bi kirî û dûr ji xwestiyên xwe kar dikir û bêyî gazinde kirin.

Em sozê didin ku li ser rêça wê varê nebîn ku li dîroka xwe ya rewena xebatê wê ji bo me kêşa û hergav dayka me ya mezin ya xwedî dilê mezin bît ku başî û bexşîn tê de ye û bêhtir jî ji şaşî û serdaçûnê dibûrît.

Rêzên xwe ji bo we dûbare dikîn û jiyaneke dirêj ji bo we dixwazîn

Wêneyek ji bo:
Hemû şaxên Yekitiya me
Doşya takekesî
Seroka Dêteya Kargêriya Bilind
Zekiye Ismail Heqî

Wiha min Rewşen Xanim Bedirxan naskir

Di biçûkaniya xwe de min li çîrok û serpêhatiyên çîrokbêj û dengbêjan guhdarî dikir. Di nav wan çîrokan de, gelek caran çîrokên mîrekên Cizîra Botan dihatin gotin.. Û wiha sal derbas bûn, ez mezin bûm.. û di nav salan de ew çîrok û serpêhatiyên mîrekên Botan, di huş û xeyala min de man û mezin bûn... Min kes ji wan mîrekan mezintir nedidît..

Di sala 1977an de çûm Almanya ji bo xwendinê. Li wir min ji kurmamê xwe sehkir ku mîr Dr. Kamiran Bedirxan ji Parîsê hatiye Bonnê bo avakirina komeleya dostaniyê di navbera alman û kurdan de.. Xweş tê bîra, min ji kurmamê xwe pirsî; gelo mîr Kamiran Bedirxan kî ye?! Got, ew neviyê mîrê Cizîra Bota ye.. Hingê careke din ew çîrokên mîrekên Botan yên ku di biçûkaniya xwe de min ew seh kiribûn hatin bîra min, û min ji xwe re got: Dêmek Dr. Kamiran Bedirxan ji wan mîrekên Bota ye..

Ewên ku ji biçûkanî ve min li çîrokên wan guhdarî dikir..

Û wiha ji wê hingê ve, bi evîndariyek mezin min daye ser şopa Bedirxaniyan bi tevayî û vê paşiyê mîr Celadet Bedirxan bi taybetî...

Di adara 1989an de, min û hevalekî xwe, kovarek biçûk bi navê *Gurzek Gul* (1989-1992) li Qamişlo weşand. Bi weşandina vê kovarê re, ez li mîr Celadet Bedirxan û pêmayê wî geriyam, ta ku ez rastî wan çend hejmarên kovara wî *Hawarê* hatim, ewên ku rehmetî Hemreş Reşo, ji 1-24, di sala 1976an de ji nû ve li Almanya dabûn çapkirin... Hem jî, ewên ku rehmetî Mihemed Bekir Axa, ji 1-9, di sala 1987an de dabûn hev û ji nû ve çap kiribûn..

Di wê navê de min seh kir ku kebaniya wî Rewşen xanim Bedirxan sax e, li bajarê Banyas, ser Derya Spî jiyana xwe derbas dike.. Ev yek di havîna sala 1989an de bû. Wiha me nemra telefona wê ji Dilawer Zengî stand. Yê ku dostaniya wî bi Rewşen xanim re gelekî gur û xurt bû û gelek kes di rêka wî û rêka apo Osman Sebrî re diçûn mala Rewşen xanim Bedirxan. Bi taybetî ji kurdên Bakur û Ewrûpa... Belê nizanim çima Rewşen xanim ji rex kurdên Suriyê ve dihat veşartin?!

Rojekê, min nav di xwe da û telefon jê re vekir:

- Elo, ev mala emîre Rewşen xanim Bedirxan e?

- Belê, ez im Rewşen Bedirxan, tu kî yî?

- Ez kurdek im, min xwest silavekê li te bikim

- Tu ji kû yî, ji kû xeber didî..?

- Ez ji Qamişlo bi te re me Emîre Rewşen, gelo ez dikarim carekê bême nik te?

- Çima na kurê min, berî tu were xeberê bide min, telefonê veke...

Û wiha me xatir ji hev xwest...

Piştî dor du heyvan ango di payiza 1989an de ez çûm bajarê Banyas, mala Rewşen xanim Bedirxan. Li gor rê û adetên kurmancî min hin diyarî, ji mal danehev û ta xwe re birin



Rewşen Bedirxan û Konê Reş

wek: Qetirmîzek hingiv, yek rûnê malê, yek penîrê malê û hin savar û nîsk..

Li Banyas, ji hotêlê, min telefon jê re vekir, soz jê stand û dawî ez çûm mala wê. Me ji nêzîk ve hev dît û hev naskir.. Gelek gilî û gazin di wê navê re derbas bûn. Berî ez xatir jê bixwazim min jê re got: Dayê! Min hin penîr, hingiv, rûn, savar û nîsk ji te re anîne, bi hevî me tu wan ji dest min bigire.. Li min vegerand û got: Te kirîne an te ji mal anîne? Min lêvegerand û got: Dayê min ji mal anîne.. Ji min re got: ma tu ne kurd î, ku tu kurd bî, ew malê min in, malê kurdan malê min e... Hem jî got; kurê min! Penîrê te aniye yê sîrika ye? Min got na.. Li min vegerand û got: Xwezî penîrê sîrika ba.. Min soz dayê ku ezê careke din penîrê sirika jê re bibim..

Ji wê çûna pêşîn ve nivisandina pirtûkeke ket serê min de li dor jiyan û xebata mir Celadet Bedirxan, hingê jî, min gelek pirtûk bi zimanê erebî û hin nivîs li dor Bedirxaniyan û mir Celadet dabûn hev.. Di çûna din de li bal Rewşen xanim Bedirxan, min projê xwe ku nivisandina pirtûkekê li dor jiyan û

xebata mîr Celadet Bedirxan jê re got, hem jî min penîrê sîrika ji penîrê mala Mihemedê Nayifê Paşê jê re bir... Wê jî bi dilekî fireh projê min pejirand û pîroz kir..

Wiha jî me xatir ji hev xwest.

Di roja (15.05.1992), ez li Banyasê, mala Rewşen Bedirxan bûm, min û wê bi hev re firavîn xwar û projeyek hevpişk danî, ku di roja 15.07.1992an de, bi me re li bajarê Qamişlo amade bibe, da ku beşdariyê di bîranîna koçkirina Mîr Celadet Alî Bedirxan de bike, hem jî ku di roja 26.05.1993an de careke din li Qamişlo amade bibe û beşdariyê bi me re di bîranîna 100 saliya jidayikbûna Mîr Celadet Bedirxan de bike...

Lê Xwedê nekir nesîb û giyanê wê di roja 01. 06.1992an de ji nav me revand, ango ji berî 17 salan ve... û ew projeya me neçû serî...

Di her du salên dawîn de, ji berî mirina wê, ez her heyv 3-4 rojan lê dibûm mêvan, di wê mêvandariyê de me dîroka Bedirxaniyan û rewşa kurdan, ji aş û bajêr ve tevdida.

Heyva ku ez nediçûm; ji min re telefon ved'kir û digot:

- Kurê min tu nehatî, xêr e?!

Di roja din de min berê xwe dida bajarê Banyas ê... û ez û wê diketin nav sihbetên dûvdirêj de..

Temenê wê di ser 80ê salî re derbas bibû, sibeha zû ji xew şiyar nedibû, navmalya wê ya çerkezî 2-3 fincanên qehwe jê re dibirin oda razanê ta ku ji nû bi hiş xwe ve dihat...

Dor saet 10ê sibehê, ji nû ez û wê li ser sifra taştê kom dibûn, û me xwe berdida nav sal û demên derbasbuyî, ew salên ku mala wê di Şamê de bibû wek navendeke ji bo lêkolîn mişextî û endamên komela Xoybûn re û di nav wan de rewşenbîr û torevanên kurdan, ma kî û ne kî... û ji min re behsa Bedirxanîyên ku li Şamê, Misrê û Urdinê behvin dikir û digot: filan ji Bedirxan e û filan ji Yezdanşêr e... û li ser zewaca xwe bi Mîr Celadet Bedirxan re wiha digot: di wê zewacê de min û Haco Axa

û Hisnî Berazî me.in bû... û gelekî pesnê Mîr Celadet dida, nexasim derheqê guhdana keça wê Useyme Xan de û pê de diçû û digot: Mîr Celadet nayê jibîrkirin, rehmetî gelekî xwe diwestand ta ku jimarek ji kovara *Hawarê* belav dikir, gelek alozî didîtin, ji ber ku nivîskar nebûn, yên ku hebûn jî bi tîpên erebî dinivîsandin û ji rehmetî re rêdikirin.. Mîr bi tena xwe nivîsên wan diguhertin tîpên kurdî-latînî û ji bo çapê amade dikirin... Ji bilî westandin û aloziyên weşandina *Hawar* û *Ronahîyê*, em di rewşeke abûrî a dijwar re derbas dibûn, tevî ku gelekan ji dost û hevalên me divîbûn arîkariyê bi me re bikin, lê rehmetî razî ne dibû û arîkarîya kesekî qebûl nedikir, bi tenê bi arîkarîya hevalên xwe yê nêçîrê Hisên Beg Îbeş û Elî Axa Zilfo razî dibû...

Rewşen Xanim, pê de diçû û digot:

- Mala me ji mêvanan vala nedibû, tev kurd bûn, ji axa û parlementêrên kurdên Cizîrê bûn, carna di nav wan de fransiz û ingilîz jî hebûn...

Û berdewam dikir û digot:

- Mîr gelekî hez kuncîlan dikir, tevî ku kêm caran ji mal derdiket, deketinên wî jî yan wê biçwa qehwexana Kemal bi dûv çareserkirina pirsgirêkên (gir û giriftên) kurdên Cizîrê, ewên ku bi dûv aloziyên xwe de dihatin Şamê, yan wê biçûwa nêçîra xezalan bi hevalê xwe Hisên Beg Îbiş re, binya Şarnê û dor Reqa û Til Ebeydê...

Carekê ez di ber jinên Sûriyê de çûm Qahîrê, min ji Qahîrê bedlekî spehî û cizmake bedew ji Mîr re anîn, di wê hingê de Cegerxwîn mêvanê me bû, dinya zivistan û sar bû, ez ji dibistanê hatim, min mêzekir ku ew bedlê bedew li Cegerxwîn e, ez dîn bûm, Mîr naskir ku ez engirime, bi fransî bi min re xeber da û got:

- Ne peyive, derbasî oda malê bibe...

Di pey min re hat û ji min re got:

- Ev Cegerxwîn e, şaîrekî kurda ye, feqîr û xizan e, ku ez lê nebim guhdar, wê kî guhdar be, ez çi li xwe kim li ber çavê xelkê rind û bedew e...

Rewşen Xanim gelek êş, kul û keder borandibûn û gelek caran qiriktalî ji destên mirovên kurd dîtibû! Û ji ber berberiya wan, di sala 1972an de, mala xwe ji Şamê barkir bajarê Banyasê û li ser vê babetê wiha ji min re got:

- Kurê min! Xwezî ez ne Bedirxanî bama, barê ku ez Bedirxanî me barekî giran e, ez pê hatime girêdan?!

Saet 5ê sibeha hizîranê (01.6.1992), zingilê telefona min lêda bi rahiştina bihîstokê, dengê jinekê hat, bi kurdiyekî Botanî ji min pirsî: Qamişlo ye? Min got: Belê.. Got: mala Konê Reş e? Ez Useyma keça Rewşen Bedirxan im ji Banyasê dipeyivim, diya min çû rehmetê, ji min re gotibû ku ez mirim, xeberê bidin Konê Reş... saet 11ê nîvro emê wê bibin Şamê...

Min jî bi lez û bez karê xwe û çûna Şamê kir û çend telefon ji dost û hevalên xwe re vekirin, bi ser riya Heleb û Şamê ve ketim, bi rê de min helbestek nivîsand li dor Mîr Bedirxan, Mîr Celadet û Rewşen Xanim, û li ser gora wan min xwend, ev in çend malik ji wê helbestê:

Erê Mîro! Felek çerx û dewran e
Rewşen Xanim îro li te mêvan e
Bigerîne civateke Botanî
Digel Rewşen û Celadet û Xanî
Rewşen Xanim wê bide te mizgînî
Îro şere li Herekolê Banî
Li Cizîra Bavê Têlî, li Şernax
Gelê kurd mil dane hevdû bi yek rex
Şiyar bûne êdî nemaye ew xew
Bexwedan û serxwebûn e û hew...

Konê Reş

Oxira nivîskareka mezin a kurd

Li 01.06.1992ê nivîskara mezin û torevana kurd Rewşen Bedirxan çû ber dilovaniya Xwedê ku 1909ê zayîniyê ji dayik bûya. Neviya Mîr Bedirxan û hevjîna rojnamevanê kurd ê pêşeng Celadet Bedirxan e û xwedê jerazî bi hesta xwe ya nîştimanî û canê xwe yê mukim li warê hişyariya perwerdeyî û civakî hatibû nasîn. Bi direjahiya jiyanê cîhê rêzgirtina hemû texên civaka kurd bû, pirtûka wê ji *Çend Rûpelek ji Tora Kurdî* yekem hewl bûye ji bo nasandina tora kurdî bi xwendevanên ereb re, ku li sala pêncîyan hatiye çap kirin û her wisa ji çend pirtûkên din ên çanda û perwerdeyê ji hene.

Rewşenbîriya kurdî bi oxira Rewşen Bedirxan stêreka geş a esmanê tora kurdî ji dest da û hergav û hêta navê wê li ramana rewşenbîrên kurd bi nemirî dimîne.

El Iraq
10.06.1991
Ji rojnameya nûçên kurd li Kurdistana Tirkiye

Sersaxiya Celal Talebanî

Yekîtiya Nîştimaniya Kurdistanê
Mekteba Siyasî
Rêzdar Dr. Cemşîd Bedirxan
Ji bo Malbata Bedirxanî yên rêzdar...

Bi dilekî pirr bi xem û kovan agahiya oxira xatûna mezin û perwerdekar dayika gelê me şahjin Rewşen Bedirxan gihişt me, li demeke ku bi rêz û hurmet li hemberî canê Xwedê jêraziyê radiwestîn û bi navê polîtburo û desteya serokayetiyê û hemû xebatkaran û Pêşmergeyên li ser axa Kurdistana Iraqê behîdariyê ji bo we û xwe û gelê kurd radigihînin ku canê pakij ê Xwedê jêraziyê herdem ê di wijdana neviyên paşarojê de zindî bimîne.

Daxwazê ji Xwedê dikin dilovaniyê bi rihê Xwedê jêraziyê bike û ji bo we û malbata we jî sebir û hedarê dixwazin.

Birayê We
Celal Talebanî
Sekreterê Giştî yê
Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê



100. SALIYA REWŞEN BEDIRXAN



Qahîre, 1944. Rewşen Bedirxan, li mala Huda Şarawî, li gel Yekîtiya Jinên Sûriye.

Şahjina Kurdistane Rewşen Bedirxan

Mîrên Botan her dem di jiyana me ya civatî û malbatî de xwediyê cihekî taybet bûn. Mirov dikare bibeje ku em bi awayekî çîrok û serpêhatiyên Mîrên Botan mezin dibûn. Di piraniya minasebetan de mînakek ji kiryarên Mîr dihatin axaftin. Dema bûyerek çêdibûya an jî tiştek biqewimiya, her tim li beranber bûyereke kevin a di dema Mîr de dihate şîrovekirin. Kurtahî wek hemî deverên Botan cihê me de jî Mîrên Botan, bi awayekî jiyana civakî de xwedî bandoreke berbiçav hebûn.

Piraniya stranên Botan li ser Mîran hatine gotin. Mirani, merdî, evîndarî, nêçîrvanî rabûn û runiştina Mîrên Botan, stranan de cihê xwe girtine. Piraniya serêle û payîzok li ser Mîr hatine gotin. Dema berê piraniya şêvbiherkên şevên zivistanan dirêj, li ser gotinên serpêhatiyên Mîrên Botan tije dibûn Di jiyana her kesek di herêma Botan de bi awayekî bandoreka dîrokî ya Mîrên Botan heye.

Sala 1929ê binemala me piştî serhildanekê neçar bûn berê xwe dane binxetê û li wê derê man û wê hingê ji nêzîk ve Mî-

rên Botan naskirin bi taybetî jî Mîr Celadet Bedirxan û Kamiran Bedirxan naskirin. Munasebetên wan gelek nêzîk çêbûn. Dema mezinên me behsa Celadet û Kamiran Bedirxan dikirin ji me re wek xeyalan dihat. Gotin û sohbetên li ser wan gelek dihatin kirin. Di van gotinan de cara yekem min navê Rewşen Bedirxan seh kir, her wiha cara yekem navê Cemşîd û Sînemxan, me ji mezinên xwe sehkirin. Hinek zarokên xwe bi wan nav kiribûn. Ji bo me Mîrên Botan wek efsaneyekê bûn.

Cara yekê sala 1982ê min yekem kes ji Mîrên Botan Rewşen Bedirxan dît. Hinek hevalên me xwestin seredana Rewşen Xanim bikin. Ji pirbûna kar min nekarî ez li gel wan biçim. Lê min soz da ku ez karê xwe biqedînim û herim bigihim wan. Rojek havînê ez li gel hevalek xwe ji Şamê çûme Banyas da ku seredana Rewşen Bedirxan bikim. Bi rastî ez gelekî bi qelk bûm. Cara yekem ezê yek ji Mîrên Botan bibînim gelo ka çawan e? Gelo ew tiştên ku me ji pêşiyên xwe seh kirin rast e yan hema çirok bûn ji me re dihatin gotin. Dema em ketin mal de Rewşen Xanim hate pêşiya me, bi rastî min nezanî ez çawa bikim. Min li hemberî xwe miroveke rehet û gelek mitevazî dît, te digot qey ev deh sal in ez Rewşen Xanime nas dikim. Helwestên wê hişt ku ez xwe li mala xwe bihesibînim, piştî fetreyekî kurt ez rihet bûm. Berî ku ez herim dizaniya ez kî me hevalên min derheqe min de zanyarî dabûn Rewşen Xanim. Gelek germî û ji dilek fireh pêşwaziya min kir. Li du rojan bûm mêvanê Rewşen Xanim. Piştre min gelek caran seredana Rewşen Bedirxan kir. Gelek sohbet li gel kir, ji nêzik ve ew qasî min karî ez wê nas bikim.

Dema cara yekem min Sînemxan dît, Rewşen Xanim hate berçavê min, gelek taybetiyên Rewşen Xanim gihanê Sînemxan.

Gelek zehmet e mirov bikaribe behsa Rewşen Xanim bike. Bi hemû awayî insanek têgihiştî, sohbet xweş û gelek rê dida



Rewşen Bedirxan, Sînemxan, Huseyma û Cemsîd. Dema diçine Misre, 1944.

ku mirov qiset bike. Lê min di hemî sohbetên xwe de dixwest ez bêhtir wê xanima nirxbilind nas bikim. Min gelek pirs jê dikirin, bêyî ku aciz bibe gelek vekirî bersiva pirsan dida û hinek bûyerên ku min dixwest ez baş tebigihim gelek zelalî ji min re digot. Ez dikarim bibêjim naskirina Rewşen Bedirxan ji bo min bû weke zangoyekê. Her cara min xatir jê dixwest, ez pê dihesiyam ku gelek tiştên nû hîn bûme. Mirov dikariya bi hemî awayî li gel wê xanima hêja bide û bistîne.

Rewşen Bedirxan dîroka siyasî û civakî wekî mirovek rewşenbîr, wek mirovek zana û wek jineke kurd bûye sembolek. Lê mixabin hê jî bi awayek pêwist Rewşen Xanim kiryarên wê, di nav gelê me de di nav dam û dezgehên me de û taybet di nav jinên kurd de baş yan jî awayê pêwist naye naskirin. Kar û xebata Rewşen Bedirxan dikare bibe ronahiya xebata jinên kurd di civata me de. Tenê pêwisti heye ku ew Rewşen Xanim baştir nas bikin, gelek kar û xebatên taybet pêkanina gelek

pirtûk û nivîsên hêja yên Rewşen Xanim hene ku divê bikevin nav civata kurd. Hinek karên Rewşen Xanim nediyar in, winda bûne. Eger ew bêne dîtin dê destkefteke gelek mezin be.

Minasebeta sed saliya jidayikbûna Rewşen Xanim, ez wê bi hurmet yad dikim. Wê xetîra (meşale) rewşenbirî û zanîna Rewşen Xanim rêya me ronî bike. Di rastiya xwe de Rewşen Xanim di nav kurdan de sembola zanebûn û azadiya jina kurd e.

Rewşen Bedirxan, jinek kurd, zane, rewşenbîr, xanimek azad kesayetiyek serbilind û hêja û Rewşen Bedirxan şahjineka kurd bû. Ew wê her tim di dilê me de Şahjinek me be.

Di sedsaliya vê xanima qedirbilind de em wekî kurd gelo çiqas me karî em bi erkên xwe rabin? Gelo di minasebeta sedsaliya yada Rewşen Bedirxan de divê em hemî rêxneyekî li xwe negirin?

Bila hezar rehmet li ser giyanê te be û hûnê her tim di dilê me de bijîn û hûn xetîra rêya ronîkirina rewşenbirî û welatparêziya Kurdistanê ne.

Dara Bîlek
02 Hezîran 2009

Helbet dîrok, kevneşopî û nirxên çandî ji bo neteweyekî girîngiya xwe heye. Mirov, ji pêşeroja xwe, çanda xwe û destpêka şaristaniyeta neteweya xwe ji rûpelên kûr ên diroka xwe fêr dibin. Çawa ku carna mirov behsa bîranînên xwe yên xweş dike û bi xweşiya wan bîranînan xwe şad bike, bi heman awayî jî netewe bi rûpelê dîroka xwe ya serkeftî jiyana xwe bi hêz dikin, pêşve diçin.

Rast e gelek caran derew û bêbextiyên xêrnexwazan jiyanê tarî dikin, lê belê dîvê mirov ji bîr neke ku rastî jî di rûpelên zelal ên dîrokê de veşartîne û dibine bersiveke herî giran a wan xêrnexwazan.

Helbet neteweyek bi kesayetiyên xwe yên bi hêz û neteweperwer û rewşenbîrên xwe dewlemend dibe. Ji ber ku ew kesayetî li hember êş û azarên neteweya xwe weki bizîyekê tevgeriyane, jê ra dermanê dabîn kirine û vê yekê ji li jiyana xwe de kirine armanc. Li hember nezanîn û kêmasiyên neteweya xwe jî weki mamosteyek kar kirine û bi perwer-



Zekiye Îsmaîl Heqî, rojnamevanek, Rewşen Bedirxan, Bexda, 1972

dekirina civaka xwe xebitîne.

Belê, rast e ku pêşeroj tovê turikên barxanevên neteweyekî ne û ji bo paşaroja xwe di zeviya şaristaniyete de têne çandin. Helbet kî di dîrokê de berhemên baş bidest xistibe, ew netewe hêjayî jiyaneke bêdawî dibe. Bi taybet ev berhem jî ji berhemên kesayetiyên rewşenbîrên wî neteweyî ve dewlemend dibin.

Di vî warî de divê em jiyana bav û kalên xwe, rewşenbîr, zana û hûnermendên xwe baş vekolin û bas bi[illegible]. Ji ber ku bingeha hebûna me, bav û kalên me ne. Bingeha [illegible]and, dîrok û şaristaniyeta me jî rewşenbîrên me ne.

Her çiqas piçek ji derveyî mijare jî be divê [illegible] bi biranîn ku pêwîste nifşa nû di vî warî de gelek hişyar be! Divê dev ji heyraniya çand û hûnera neteweyeke din [illegible] li ser koka çand û hûnera xwe kesayetiya xwe bibînin, [illegible] li ser tova xwe.

Eger em temaşa diroka xwe bikin, helbet emê rasti bi sedan rewşenbîrên xwe yên heta niha jî li asmanê welatê me wekî stêrkên ronahiya xwe pêşkêşî netewa xwe dikin. Helbet yek ji wan stêrkan jî rewşenbîra kurd Rewşen Bedirxan e ku berî hevdeh salan (11.07.1909 Qeyserî - 01.06.1992 Banyas) wekî îro xatira xwe ji netewa xwe xwest û koça dawî kir...

Bi rastî ez naxwazim li vir zêde behsa jiyan û kar û xebata Rewşen Bedirxan bikim. Ji ber ku gelek nivîskar û rewşenbîrên me di vî warî de keda xwe kêmnekirine. Lê divê bîranînê da ez dixwazim bi vê helbesta Dr. Bedirxan Sindî wê bi bîr bînim.*

Di dawiyê de jî dibêjim, civakên bi hêz bi paşmayên xwe bi hêz dibin. Kî ji wan civakan zêdetir bikare sûd ji wan paşmayan wergire ew civak civakeke herî şaristanî û serketî ye. Her wiha dema mirov rastî astengiyek dibe, mirov piçek paşve vedigere û hêza xwe distîne, berfirehiyê dibîne û paşê jî bi hewldanan ji wê astengiyê rizgar dibe. Kerem bikin, hûn jî deriyek ji bo xwe vekin, piçek paşve biçin û li vê roja bîranîna 17 saliya koça dawî de, ji ronahiya stêrkek ji reşwenbîra kurd Rewşen Bedirxan sûd werbigrin...

Mîrhac Mistefa
Hewlêr
01 Hezîran 2009

* Helbest di rûpel 67 de ye.



Rewşen Bedirxan, li Kurdistanê.



Huseyma, Rewşen Bedirxan, Sînemxan Bedirxan, Qedrî Celîlî Cûrk, Beyrût, 1959

100. jidayikbûna Rewşen Bedirxan (1909-1992)

Her wekî diyar e ku Bedirxanî di dîroka tevgera gelê kurde de, xwedî cihekî bilind û biha ne, çi di warê xebat u bizava netewî de be û çi di warê wêje û rewşenbîriya kurdî a giştî de be.

Rewşen xanim jî neferek ji vê malbata dêrîn e. Wek diya kurdan dihat naskirin, kurdan jê re digot Dayê. Dayê Rewşen xwedî hestekî kurdeyatiya resen bû, pir dilovan û dilsoz bû, dêmê wê di rengê dêmên jinên ewrûpiyan de bû, nerîna çavên wê kûr û tûj bûn, dema ku mirov cara yekemîn pê re rûdinişt û lê guhdarî dikir, hestekî bi tirs diket nava cegere wî de.. Mezinahî û serboriyek dûr û dirêj di tîpên rûyê wê de xuya dikir, mirov dixwest her dem pê re rûne û lê guhdarî bike, nemaze dema ku serpêhatiyên jiyana xwe û mîr Celadet Bedirxan digot û dibiland.

Di roja 01.06.2009an de 17 sal di ser koçkirina Rewşen xanim Bedirxan re derbas dibûn û di roja 11.09.2009an de 100

sal di ser roja jidayikbûna wê re dibuhurin.

Rewşen xanim Bedirxan eva ku gelekan ji me navê wê bihîstiye, an pirtûken ku wê ji tirkî wergerandine erebî xwendiye, an pirtûka ku wê di sala 1954an de, bi navê *Çend Rûpel ji Wêjeya Kurdî* berhev kiriye, xwendiye. Ev yekemîn pirtûk bû, ku xwendevanên ereb bi rêka wê serwextî wêjeya kurdî dibin...

Rewşen xanim Bedirxan: Eva ku yekemîn jina kurd e, bi kurdiya latînî di kovara *Hawarê* de nivîsandiye... Yekemîn jina kurd e ku gelek xebat, bizav û çalakiyên têvel, di ber kêşeya gelê xwe de li Şamê kiriye, û di nav biyaniyan de dihat nas kirin wek sembolekê ji rewşenbîriya kurdî re..

* * *

Rewşen xanim Bedirxan kî ye? Neviya mîrê Botan e, dotmama û kebaniya pispor û zimanzanê bejinbilind mîr Celadet Bedirxan e. Ji Bedirxaniyên pir belav di çar kenarên cîhanê de, ew mabû ku, pêmayê Bedirxaniyan ji, diroka Cizîra Botan, mîrgeha mîr Bedirxan, serboriya mîr Celadet û Dr. Kamiran li ser refikên pirtûkxaneya hiş û xeyalê xwe de diparast û di mala xwe de bi zimanê kurdî bi keça xwe Sînemxan û kurê xwe Cemşîd re diaxivî.

Li gor her 83 salên ku di sere derbas bibûn, danûstandina wê bi welatparêzên kurdan re hebû û tev jê re bibûn pend, zanîn, kurdzanîn û zanîndan.. Ta berî ku koça dawî bike, Rewşen Bedirxan a tekane bû di nav Bedirxaniyan de ku navê Bedirxaniyan diparast. Wê jî mîna herdu pismamên xwe Mîr Celadet û Dr. Kamiran Bedirxan ew şop dimeşand... Ji ber ku piraniya Bedirxaniyên din ji neçarî razi bûne ku li şûn navê Bedirxan "Çinar" bê nivîsandin, bi taybetî ew Bedirxaniyên ku li Tirkiyê mane wek zarokên Tewfîq beg Çinar bû niha li Sten-

bolê dijîn û zarokên Hikmet beg Çinar ku niha li Anqere û Adane dijîn û malbata Walî ku hiha li Misrê, bajarê Feyûm dijîn û fîlmçêkerê bi nav û deng di nav ereban de Ehmed Bedirxan û kurê wî rejîsorê navdar Alî Bedirxan û gelek Bedirxaniyên din ku niha li Misrê dijîn, ji bilî Bedirxaniyên ku li Sûriyê ne wek zarokên Yûsif Bedirxan, ku niha li Şamê, taxa Mihacirîn dimînin û zarokên Sureya Bedirxan yên ku li Urdin, bajarê Eman in.. Lê mixabin nizanin bi zimanê Bedirxan, Tenê Rewşen xanim; navê Bedirxan, dîrok û zimanê wî bi xwe re hilanî û ta roja dawîn ji temenê xwe.

Rewşen xanim, di roja 11ê tîrmeha 1909an de li bajarê Qeyserî hatiye dinyayê, dema ku bavê wê di sirgunê de bû. Ew ji rex bav ve, dibe; Rewşena Salihê Mehmûdê Salih (birayê mîr Bedirxan). Ji rex dê ve ew dibe; Rewşena Samiya Bedrî paşa (kurê mîr Bedirxan).

Rewşen xanim bi tenê çar sal ji biçûkaniya xwe li Stenbolê derbas kirine. Di sala 1913an de, careke din Bedirxanî, ji Stenbolê û Tirkiyê hatine sirgunkirin û di Rojhilata Navîn û Afrîqyayê de belav bûne, nemaze di Misrê, Libya, Suriye û Libnane de, hingê para bavê Rewşen, Salihê Bedirxan li Şamê, taxa Salihiyê ketiye, hingê ji vê taxê re dihat gotin "Salihiyet Elekrad."

Li Şamê, Rewşen xanim dest bi xwendinê kiriye di dibistana Tereqî de, di pey re sê salan di mamostexanê de xwendiye, ta ku di sala 1925an de bûye mamosta zimanê erebî di quna xa seretayî de li Şamê. Pey re du salan zimanê tirkî û sê salan zimanê fransî û ingilîzî xwendiye û wiha ferî van zimanan jî bûye.. û bûye mamosta zimanan li Urdûnê, bajarê Kerek, hingê Urdûn û Suriye yek bûn.

Sê salan li Urdûnê maye, di sala 1928an de zîviriye Şamê û li Şamê mamostetiya xwe berdewam kiriye ta sala 1935an, jê pêve bûye berpirsiyara dibistanê (mudîre), ta sala 1964an hingê ew vegerandine karê wê yê berê mamostetiyê. Ew jî di

wan salan de ji kar aciz dibe û temenê wê jî mezin dibe, vêca teqawîta xwe distîne û li mala xwe rûdine.

Di vê navberê de du caran dizewice; cara pêşîn di sala 1929an de bû, bi xortekî ereb re ji Suriyê navê wî Omer Malik Hemdî, lê pê re dom nekir, di sala 1931ê de hev û din berdan, bi tenê keçek bi navê Ûseymaxan ji vê zewacê maye, Rewşen xanim ev keça xwe bi xwedîkirin daye ta ku ew zewicandiye bi Zihêrê Alî axa Zilfo re. Niha ev keça wê li Qahîre dimîne, sê keçen wê hene; Şêrîn, Nesrîn û Rewşen.

Cara dudiwan di sala 1935an de, bi kurmamê diya xwe mîr Celadet Bedirxan re dizewice. Bi vê zewacê kefxweş û şad dibe. mîr Celadet di sala 1927an de nû ji Ewrûpa dizîvire Libnanê û tê Şamê. Li Şamê çav bi Rewşen xanim dikeve û hev nas dikin... Piştî beravêtina şoreşa Agrî û weşandina kovara *Hawarê*, mîr Celadet û Rewşen xanim, ra û devdîrên xwe dikin yek û bi hev re dizewicin.

Ji vê zewacê du zarok ji wan re çêdibin; keçek bi navê Sînemxan di 21.03.1938an de çêdibe, di sala 1957an de bekeloriya distîne û di zankoya Şamê de xwendina xwe di avokatiyê de dixwîne, di sala 1961ê de bi endezyar, niviskar û wergêr Selah Sadella re dizewice -mamoste Salah ji xelkê Zaxo ye- du zarok ji wan re çêdibin, Azad û Dilnaz. Lê kur bi navê Cemşîd e, di dawiya sala 1939an de çêbûye, di sala 1958 an de bekeloriya li Şamê standiye, diya wî, ew di deynê salê de, li ser kîsê xwe rê kiriye Almanya da ku bibe bijîşk, wek ku bavê wî mîr Celadet dixwest.. Li wir, xwendina xwe bi dawî anî û jinek almanî ji xwe re anî, ji wê jinê kurek û keçek jê re çêbûn, kur navê wî Kurdo ye, niha doktor e, li Almanya dimîne û keç navê wê Julia Evîn e, ji berî du salan ve Evîn bi navê Cegerxwîn Jiyan Bedirxan re zewiciye û herdu li Almanya dimînin. Dr. Cemşîd, di 10 meha dêsembe a 1999an de li Brazîl çûye ber dilovaniya Xwedê, gora wî li Almanya bajarê Koplinz e.

Berdewamiya jiyana mîr Celadet û emîre Rewşen di gelek qonaxên dijwar re derbas bûye, gelek rojên bi cefa dîtine; xaniyê wan bi kirê bû û ta roja ku emîre Rewşen koça dawîn kir di xaniyê bikirê de bû.

Li ser rewşa wî a çetîn û xaniyê bikirê wiha ji min re got: kurê min binivîsîne: haza min fezil elekrad, ango, eve qenciya urdan e ku bi min kirine... Tiştê ku ji kovara *Hawar* û *Ronahiyê* dihat destê wan, jiyana xwe pê derbas dikirin. Tevî ku dewletên mîna Fransa, Îran, Urdûn û Tirkiyê dixwestin alîkariyê bi mîr re bikin lê mîr alîkariya wan qebûl nedikir. Tenê razî bû bi wî tiştê ku ji kovarên wî dihatin destê wî, di gel mehiya kebaniya wî Rewşen. Bi van herdu jêderên diravî jiyana xwe derbas dikirin, tevî ku xaniyê wan ne li gor wan bû, lê ew pê razî bûn.

Bi bûyera ku mîrê mezin, rojnamevanê jêhatî Celadet Bedirxan pê çû ber dilovaniya Xwedê, di bîra qederê de roja 15.07.1951ê, Emîre Rewşen Bedirxan nia dil biêş û xemgîn rewşa wê a aborî jî, êdî nema pê re alîkar bû û kesî ji kurdan lê nepirsî, ne jî alîkarî pê re kirin.. Vêca ji neçarî di sala 1972an de mala xwe ji Şamê barkir bajarê Banyasê, ser keviya Derya Spî, li wir xanîk ji xwe re kirê kir û tê de ma ta roja dawîn ji temenê xwe. Bi tenê pîrejinek çerkez, bi navê Sebahet (xwîşka jina helbestvanê kurd Qedrîcan bû), pê re dijiya û alîkariya wê dikir..

Hin ji xebatên Rewşen Bedirxan di warê rewşenbirî de:

Rewşen xanim, di navbera sala 1925-1926an de ji bo doza erebî dijî fransizan bi nivîsan sekiniye û bi taybetî di rojnameyên felestîniyan û kovara *Munîrva* a Libnanî de.

Di navbera salîn 1926-1973an de, gotar ji kovara *El Hurriyê* re dinivîsandin, ewa ku xwediyê wê Yûsif Melek bû. Di navbera salên 1958-1959an de, çîrokên zarokan di radyoya Suriyê de belav dikirin.

Di sala 1957an de, di ber gelê xwe de çûye Yonan, di kongereya Antî Kolonyalizmê de bi tena xwe amade bûye û her çar kursiyên ku navê Kurdistanê li ser wan hatibû nivîsandin, bi heybet û sawa xwe dagirtin. Tevî ku gelek kes li dij wê sekinîn û rêtengî jê re çêkirin mîna Mîşêl Eflaq, lê wê guh li wan nekir û navê gelê xwe bilind kir, bi tenê sefîrê Sûriyê Yorkî Hekîm li pişt sekiniye, wek ku wê ji min re got...

Rewşen xanim bi zimanê kurdî, erebî û tirkî dinivîsand û di karîbû bi zimanê fransî û ingilîzî bipeyve wek yekî fransî û ingilîz..

Di sala 1971ê de, çû Kurdistana Iraqê, serdana Mela Mustefa Barzanî û li Hac Umran û bi jinên Kurdistanî re Hevgirtina Afretên Kurd dameziran...

Ji wergerandina pirtûkan

1. *Bîranînên Jinekê*: Ev pirtûk ji zimanê tirkî wergerandiye bo zimanê erebî û di sala 195ê de li Şamê çap kiriye.

2. *Bîranînên Keçek Mamoste*: Ev pirtûk jî, ji zimanê tirkî wergerandiye bo zimanê erebî û li Şamê çap kiriye.

3. *Evîna Min û Jana Min*: Ev pirtûk jî, ji zimanê tirkî wergerandiye bo zimanê erebî û li Şamê çap kiriye.

4. Çend rûpel ji wejeya kurdî: Ev pirtûk di sala 1954an de çap kiriye wek wefadarî ji bîranîna mîr Celadet Bedirxan re.

5. *Nameyek ji Mistefa Kemal Paşa re*: Ji tirkî wergerandiye erebî û di sala 1990 li Şamê bi alîkariya Dilawer Zengî çap bûye.

6. *Doza Kurdî*: ji zimanê tirkî wergerandiye bo zimanê erebî û di sala 1990 de, Dilawer Zengî li Şamê çap kiriye.

7. *Gramêra Zimanê Kurdî* a Mîr Celadet û Roger Lescot e, ji fransî hatiye wergerandin bo zimanê erebi u di sala 1990 de, Dilawer Zengî li Şamê çap kiriye.

Konê Reş



Basra, 1975. Şîrîn, Wefa, Rewşen Bedirxan, Zînet, Kamiran û Alî



Meziyet Xanım û Rewşen [illegible]



Şam. Konsolê Sovyet, înemxan Bedirxan, mirovê wan Sabit, Rewşen Bedirxan û Fatih Muderris (şêwekarekî kurd)



Şam, 1957. Rewşen Bedirxan, Sînemxan Bedirxan, Kamuran Bedirxan, Mustafa, Na'ma Alî Axa Zilfo



Rewpen Xanim ü Cumpid, 1942



Lozan, 1977, li gel Nûredîn Zaza, kurê wî Şengo, Michtield, (Jina Cemşîd), Sînemxan Bedirxan kurê Cemşîd Curd (Kurd) hilgirtiye.



Rewşen Bedirxan, Michtield (jina Cemşîd), Curd (Kurd, kurê Cemşid) u Sînemxan Bedirxan, Parîs, 1977



Huseyma, Dilnaz, Rewşen Bedirxan, Sînemxan û Nûrî (birayê Selah Saadalla), Pumping Station, K3 Iraq, 1962



Sînemxan Bedirxan, Rewşen Bedirxan, zarokên Sînemxan Dilnaz û Azad. Zaxo, 1967



Rewşen Bedirxan, Koye.



Rewşen Bedirxan, li ber qebra Celadet Bedirxan, 1952



Rewşen Bedirxan û Sînemxan Bedirxan

Di amadekirina vê kitêbê de keda herî
mezin a wê ye. Wê ne tenê arşîva malbatê
ji me re vekir, her cara pêwist bû ji
Hewlêre bi email, telefona destan û dawî
dema wan têr nekir bi skype gihîşte
hawara me.
Spas Sînemxan Bedirxan!
Bêyî te ev kitêb çênedibû.

avesta

REWŞEN BEDIRXAN

Dotmam

Ji bo biranîna Rewşen Bedirxan

avesta | JIYAN

avesta | JIYAN: 274 | 15
Dotmam
Rewşen Bedirxan (1909-2009)
Ji bo bîranîna Rewşen Bedirxan

Edîtor: Abdullah Keskin
Berg: Azad Aktürk
Xwendin û Mîzanpaj: Avesta
Çapa Yekem: 2009, Stenbol

Çap: Berdan Matbaası
Sadık Dasdöğen Davutpaşa Cad.
Güven San. Sit. C Blok, No: 239
TOPKAPI / İSTANBUL
Tel: (0212) 613 12 11

© Avesta, 2009
Ji xeynî danasîne beyî destûra
weşanxane bi tu awayî naye kopîkirin

AVESTA BASIN YAYIN
REKLAM TANITIM MÜZİK DAĞITIM LTD. ŞTİ.
Kızkız Ağacı Caddesi
Öğüt Sokak No: 7
BEYOĞLU / İSTANBUL
Tel-Faks: (0212) 251 44 80 - (0212) 243 89 75

Ekinciler Caddesi
Nurlan Apt. Giriş Katı No: 2
OFİS / DİYARBAKIR
Tel-Faks: (0412) 223 58 99

www.avestakitap.com
info@avestakitap.com

ISBN: 978-9944-382-74-8

naverok

Were Dotmam / Celadet Alî Bedirxan / 9
Ji bîranînên Rewşen Bedirxan / Sînemxan Bedirxan / 17

BÎRANÎNÊN KONGREYA ATÎNA A LI DIJÎ KOLEDARIYÊ (1957) / 19
DAWETNAME / 21

BÎRHATINÊN KONGREYA ATÎNA / Rewşen Bedirxan / 23

ÇEND NIVÎS / 43
Kebanî û mamoste / 45
Jin û bextiyariya malê / 47
Derfeta raman / 49

HEVPEYVÎN / 51
Li mala Rewşen Bedirxan / Firat Cewerî / 53

JI BO BÎRANÎNA REWŞEN BEDIRXAN / 59
Şahjin Rewşen Bedirxan / 61
Rewşen Bedirxan / 65
Dema Xanime barkir / Bedirxan Sindî / 67
Çend wêstgehên geş li ser jiyana
Rewşen Bedirxan / Kemal Mezher Ehmed / 71
Belgename / İhsan Serzad / 73
Yekîtiya Afreten Kurdistane / Zekiye İsmaîl Heqî / 75
Wiha min Rewşen Xanim Bedirxan naskir / Kone Reş / 77
Oxira nivîskareka mezin a kurd / El Iraq / 83
Sersaxî / Celal Talebanî / 84

100. SALIYA REWŞEN BEDIRXAN / 85
Şahjina Kurdistanê Rewşen Bedirxan / Dara Bîlek / 87
Bîranîna Şahjineka Kurd / Mîrhac Mistefa / 91
100. jidayikbûna Rewşen Bedirxan (1909-1992) / Kone Reş / 95

REWŞEN BEDIRXAN-Di 11ê Tîrmeha 1909ê ji dayik bûye, keça Salih Bedirxan e. Rêvebira Xwendingeha Leyla Exîlî ye. Jina Celadet Bedirxan e ku bandoreke baş li ser wê hebûye heta ku mîna wergerek bikare li warê zanistî û kirdarî ve gavên baş biavêje. Ji sala 1924 ve heta 1927ê rêvebera dibistaneke hikûmî bûye li bajarê Kerek li rojhilata Urdinê, piştî hingê hatiye Dîmeşqê (Şamê) û saleke xwendinê li dibistana Elayîk ya fransî kar kiriye û li hemû polên şaxê keçan de mamosteya zimanê erebî bûye. Li 9ê Nîsana 1929ê wekî mamoste li dibistana hikûmî li Dîmeşqê hatiye damezrandin heta destpêka sala 1924-1925ê ku bi rêvebirina dibistanê bi wê ve hatiye girêdan. Tevlî komeleya Yekîtiya Afretan bûye li sala 1934ê, piştî vegerîna wê li kongreya jinan ya ku li Qahîrê hatiye li darxistin li dumahîya sala 1945an veqetiyaye. Li sala 1951ê du çîrok ji zimanê tirkî wergerandiye, ya yekem bi navê "*Bîranînên Jineke*" hatiye çap kirin û ya dûyê jî bi navê "*Evîn û Janên Min*" hatiye çap kirin û wê hinek pirtûkên neçapkirî hene ji wana "*Bîranînen Jineka*" û "*Rêka Dil*". Her wiha wê "*Çend Berperek Ji Tora Kurdî*" heye. Hinek semînar û çîrok hene ku li radyo û rojnameyan de hatîne weşandin û çap bûne. Li sala 1947ê li radyoyê çend mehan li beşa zarokan de kar kiriye. Roja 03.06.1992 çû ser dilovaniya xwe.



Spasî

Ji bo alîkariya wan
em spasiya rêzdar Celal Talebanî û xatûn Hêro Îbrahîm Ehmed dikin.

Sînemxan Bedirxan



Rewşen-Celadet Bedirxan, Şam, 1935

Were Dotmam

Were dotmam, ava şetê me şerbet e
Pela nave li hev dikete
Hevîniya xelk û alem ji heyamê pêxembera adet bî
Ya min û ya dotmama min li Cizîra Bota, biye qebahet e

Hey dotmam, hey dotmam
Gul û gulçîçeka nava koman
Heçt derdê dotmama ne dîne
Bira ji min mekin gazind û loman

- Ji Haco Axa re

Dotmam welê ye, heta mirov xwe nas dikit mirov emrê xwe xelas dikit.
Ez pîr bûme. Di derxika canê min de çil Buhar bişkivîne. Qurma bedena min çil Zivistan ditîne. Bi sedan ba û bahosan ew hejandine, bê hejmar berf û baran tê re çûne.
Herwekî dibêjin ciwanî bizaniya pîrî bikariya. Le pesn ji Xwedê re ko hêj ew çend ne pîr im ko nikarim.
Wekê ez jî ciwan bûm, simbêl hêj nû aveti bûn ser hevên min, dilê min bi hevîniya delalan hildavêt, hon ne yek, ne dudo, ne deh, ne bîst bûn. Kej û gewr, esmer û genimî, bepalalnd u navîn, kinên we jî hebûn.
Hon hemî ji min, ji me re bûn. Me kipan bixwesta, ne ewr, ne mamên me, ne digotin no. Le min, me hemiyan mizam bûn.
Çavên me bi we, bi bedewiya canu giyanê xo ne diket.
Me dev ji we berda bûn. Yeki bayan dikirt, hon diswestin. Me ji xwe re ne dikir namin. Hon dikirin. Hon beqedi dikirin. Di rêzika dinyayê de hon tayeh dibûn. Ey ne canê we, le ye me bu

Hon di gulistana mala me de gul û bişkojin bûn. Baxvan û dîdevanên we em bûn. Bihna we a xweş, rengê we ê geş û birewş tu dibêjî qey ne ji me re bûn. Em pê ne dihesiyan. Me ew ne didîtin.
Yek dihat, deste xwe direjî we dikir, hon diçinîn, dibirin. Pêde welê bû. Hon, gulên gulistana me dihatin çinîn, me guh ne dida, em pê bendewar ne dibûn.
Rojekê, me hew dît, gulistan bê gul, daristan bê bilbil maye. Em di himbeza jinên biyanî, hon di bin çengê mêrên nenas de. Bi vî awayî me xwerûtiya tovê mala xwe, tovrindiya malbata Azîzan winda dikir.
We zaro dianîn, li me li xwalên xwe dihatin. Merd, cwamêr, xweyrûmet. Ji bavên xwe re namûs dikirin.
Zarowên me li xwalên xwe dihatin. Xwalên wan kûrên kê? Ji kîjan ra û nijadî? Ji kîjan mal û malbatê?
Wan navên me hildigirtin. Yên we ko ji zikê mala me derdiketin li ser dara bavê xwe şîn dibûn.
Here dotmam, kecmama çeleng, tu çûyî, hon çûn. Em di destê jinên biyani de, hon di bin rikanê mêrên nenas de.
Zarowên we xwarziyên me ne. Lê ne xwarzînên adetî. Li şer xwal û xwarzî Lê ne xwarziyên me. Ji ber ko ne ji nijadê me ne, xerîbî wî nijadî ne. Carin hene, neyarê wî nijadê pak in jî. Bele li şer xwal û xwarzî. Xwal û xwarzî li rex hev, berê wan li armancekê şer dikin. Xwarziyên me li me radibin. Berê wan li berê me ye. Em armanca wan, ew armancên me ne. Heçko em ji hev re polik in. Bi destên hev, di destên hev de dimirin. Dotmama delal, ma ne heyf e, xwîna zikê te bi xencera min bête rêtin. Ma ne mixabin e, kekên te bi berikên berê zikê te bikevin...
No! no! Dotmam, hevraniya pismam, êdî bes e, hew bibe jina xelkê, bes bibe dêya nekurdnijad. Vegere were himbêza pismamê xwe, paxila kurmamê xwe.

"Vegere" ev ne gotineke rast e. Em nikarin ji te re bibêjin "vegere." Ji ber ko tu ne çûyî, me tu rêkirî. Me bi destên xwe tu hinartî mala xelkê.
Himbêza xwe veke ez ji te re têm. Min himbêz bike. Min wek mêr, pismam û her tiştê xwe maço bike.
Dotmam, min ji te re got ez pîr bûme. Lê pîriyê ez hişyar kirim.
Buhar ciwanî ye, Zivistan pîrî. Zivistan piştî Buharê tê. Di Zivistanê de Buharinen veşartî hene.
Herê dotmam were, xwe berde himbêza pismamê xwe. Ezê ji te re, ji Zivistana xwe a sar buhareke germ çêkim.
Were dotmam, heyraniya pismam were, xwe di germiya dilê min ê ciwan ciwaniya min a kevn de bigermîne.
Were dotmam were, ez stûna heyîna te a stiwar im, tu jî bibe rewşa jiyîna min a Rewşen.

Celadet Alî Bedirxan
Şam, 18 îlon 1934
Hawar, hejmar 26



Rewşen Xanim û Celadet Beg li mala xwe
a li Şamê, 1936







Sûriye, 1940
Rewşen Bedirxan, Kudret (keça Sureya Bedirxan) Prens Rakan û Mîr Celadet Alî Bedirxan

Rewşen Xanim û Celadet Beg, Şam, 1935 →



Beyrût, 1946
(Jipiya, ji aliyê çepê) Husnî Beg Berazî (serokwezîrê Sûriye),
Celadet Alî Bedirxan, Cemşîd û Sînemxan Bedirxan
(Ên rûniştî, ji milê çepê) Rewşen Bedirxan, Behîre Xanim
(jina Husnî Berazî)

Bi hatina sala 2009ê, 100 sal li ser ji dayikbûna şahjina kurd Rewşen Bedirxan re derbas dibin. Ji bo vê yekê, ez dixwazim hinek tiştê ku ji me re kiriye, em zarokên wê, tevî tiştê ku ji miletê xwe yê kurd re kiriye, behsa nivîsandin û berhemên wê bikim.

Ji ber vê yekê bi alîkariya hevalan, me dixwest em rêwresmeke bîranînê li dar bixin, rêwresmeke li gora cihê wê yê netewî û rewşenbîrî û civakî ku li yekê meha hezîrana sala 1992yan li bajarê Banyasê li Sûriye ji nav me bar kir çû ser dilovaniya xwedê. Ew ji dûrî welatê bav û kalan Cizîra Botan bû ku malbata Bedirxaniyan bi zorê jê bi dûr ketibûn. Piştî serhildana Mîr Bedirxanê Ezîzî, a ku osmaniyan ew serkutkir, ev malbat nefiyî gelek deverên cîhanê bûn.

Bavê Rewşenxan jî Mîr Salih Bedirxan li Sûriyeyê bi cih bû. Rewşen Bedirxan li wir xwendina xwe qedand, li wir zewicî û her wiha li wir bi tenê, bêkes, dûrî zarokên xwe û hezkiriyên xwe jiya û heta ku çû ser dilovaniya xwedê.



BÎRANÎNÊN
KONGREYA ATÎNA
A LI DIJÎ KOLEDARIYÊ
(1957)

Ji bo vê rêwresmê, min dixwest ez hinek kitêbên wê ku ez bawer bûm wergerên wê bûn bicivînim. Ji bo vê yekê jî min seredana Serok Mam Celal kir ku ez gelek spasiya wî dikim ku hinek ji dema xwe ya bi nirx da min û ji min re tekez kir ku ew kitêba ku rehmetî Abdulrehmanê Zebîhî nivîsandibû û bi navê Mehmûd Hesen Şinûbî hatibû belav kirin, bi destê Rewşen Bedirxan hatibû wergerandin. Lê belê ji ber astengiyên ewlehiyê navê xwe li ser nenivîsandibû û wisa jî kitêba *Nameya Gelê Kurd* ya helbestvanê kurd ê mezin Goran, a ku di sala 1954an de belav bûbû an ji bo Kongreya Têkoşîna li Dijî Koledariyê, ku li Atîna di sala 1957an de li darketibû. Kesên ku ji Suriye vexwendibûn Rewşen Bedirxan û Mam Celal bûn. Ji ber gelek sedeman gelek kes nikaribûn wê demê beşdar bibûna. Mam Celal ji min re teqez kir ku piştî mirina wê, xwestibû ku mala wê li Banyasê weke xwe bimîne. Bi hemû tiştên tê de, da ku bibe mozexaneyek û hemû pirtûk û kelûpelên nava malê û karê wê yê destan, her wiha tevî nivîs û kitêbên bavê min Mîr Celadet Alî Bedirxan li wir bimîne. Lê mixabin xuşka min Useymaxan wê demê bi ya wî nekir û bû sedema wê yekê ku ew karên wê û kitêbên wê yên li Sûriye belav bibin.

Ez hêviyê ji xwedayê dilovan dikim ku li darxistina vê rêwresmê de em serkeftî bibin û ev rêwresm li gor cîhê wê yê netewî, wêjeyî û ramanî bibe.

Sînemxan Bedirxan
12.03.2009

DAWETNAME

Komeleya Helenî ya li Dijî Koledariyê
Cihê Giştî: Atîna (Yonan)
Cade: M.M. Binaki 28
Tel: 20317

Atîna 22 Çiriya Pêşîn 1957
Xanim Rewşen Bedirxan
Taxa Muhacirîn
Dîmeşq-Sûriye

Xanima min a birêz

Em bi hêvî ne ku hûn agahdar bûbin ji bona civîna me ya ku biryar e di meha çiriya pêşîn de li dar bikeve ji bo Kongreya Têkoşînê li Dijî Koledariyê a Miletên Hewza Deryaya Spî û Rojhilata Navîn, ku ê bi Serokayetiya Komeleya Yonanî ya li dijî Koledariyê û bi alîkariya van rêxistinan li Atîna li darkeve.

Encûmena Cîhanî ji rizgarkirina ji koledariyê bi serokatiya birêz F. Brokoy helbijêrê Parleman û Komîta Dad û Azadiyê ji welatên Piş Derya. (sekreter C. Ros).

Partiya Sosyalîst a Îtalî bi nûnertiya birêz Losyo Lorato hilbijêrê Parleman.

Enî û Tevgera rizgarkirina Cezayir. Rêxistina dijî Koledariyê a xortên Misrê û Partiya Sosyalist a Lubnanê...

Armancên vê kongreyê bi kurtî di vê rûpelê de ne, naveroka wê ev e:

- Pêşniyar, vexwendin, raport

ANTICOLONIALE HELLENIQUE

Athènes le 22 Octobre 1957

Madame
ROSHAN Badir K H A N
MAHALLAT AL
MUHAJIREEN

D A M A S

S y r i e

Chère Madame,

Dans l'espoir d'avoir pris connaissance de la réunion projetée pour le mois de Novembre du congrès anticolonial pour la Méditerranée et le Moyen - Orient qui vient se tenir à Athènes, convoqué par la Ligue anticoloniale Grecque, en collaboration avec les organisations suivantes: World Council for colonial liberation, qui est présidé par mr. F. Brockway M.P., comité Justice et Liberté Outremer (Sécrétaire général, J. ROUS), le parti socialiste italien représenté par mr. Luccio Luzzatto M.P., le front et le Mouvement pour la liberation de l'Algérie, l'organisation anticoloniale de la jeunesse d' Egypte, the Egyptian Bar Association, le parti Neo-Destour de Tunisie, le parti socialisteà de Liban etc.

Les principes et les buts du congrès sont résumés dans la feuille annexée portant le titre 'Suggestion-Invitation Rapport'

Dans l'espoir de vouloir de nous faire également l'Honneur de prendre part à notre congrès, vous êtes priés après avoir pris connaissance des details mentionnés ci-dessous et concernant l'organisation de notre congrès de nous repondre si vous êtes d'accord de prendre part à notre congrès.

Dans le cas affirmatif vous êtes informée que le nombre des delegués qui est prevu pour chaque Etat est de 10 à 15 et ils doivent être à Athènes le 31 Octobre au plus tard.

Les frais de voyage des delegués comme aussi les frais de séjour qui sont évalués à 3 livres sterling-papier, par jour, tous frais y compris seraient assures par les organisations représentées au congrès, comme aussi par les organisations ouvrières, politiques, intellectuelles et morales de votre pays.

Dans l'attente de votre réponse, par telegramme et à mon adresse personnelle, qui est: Nikos POULIOPOULOS Lawyer Aolou street 78 Athènes Grèce, vous êtes priés de vouloir bien agréer l'expression de nos sentiments les plus distingués

Le Président

Ci-inclus: Invitations officielles
Rapport

Dawetname



BÎRHATINÊN KONGREYA ATÎNA A LI DIJÎ KOLEDARIYÊ KU DI 01.11.1957 DE LI DAR KET

Nivîs: Xatûn Rewşen Bedirxan

- Em bi hêvî ne ku hûn jî beşdarî vê kongreyê bibin, û em dixwazin ku hûn agahdar bin li ser hemû tiştên girêdayî ne bi kongreya me ve û em li hêviya bersiva we ne dema ku hûn bipejirînin.

Dema hûn bipejirînin, em we agahdar dikin ku hejmara endamên ku ê beşdar bibin ji her welatekî ê panzde kes bin û divê bigihîn Atîna, bi kêmanî di 31ê çiriya paşîn de.

Peyvên sekreter û danîştinê rojê sê cuneyhên istirlînî ne, û mesrefên din ji aliyê rêxistinên amade di kongreyê de û rêxistinên karker û siyasî û rewşenbîrî li welatê we ve ê bên danîn.

Em li benda bersiva we ne di riya boxê re yan jî li ser riya adresa min a kesatî

Nikos Yolyo Bolos 78 Cada Avokat Olo.

Atîna - Yonan

Rêz û hurmetên me bipejirînin

Serok
îmze

Naverok: Vexwendina resmî

Raport: Berqiya ku ji Doktor Kamiran Bedirxan re hatiye şandin

Şanda kurdî

Nîkos Yolyo Bolos, Cada Endazyar Olo. Atîna

Em piştgiriya we dikin

Kamiran Bedirxan

Lidarxistina kongreyê heta roja 02.11.1957 dereng ket.

Em saet 06:45 roja Pêncşemê 31.10.1957, ji Beyrûtê bi re ketin. Û ez giham Atîna saet 09:45. Min kesek li balafirxanê nedît. Ne ji ber bêrîkên ba û baranê bûna rê xweş bû. Lê propaganda amerîkî bi dû min ket, heta di firokexanê de jî, ji ber yekî amerîkî xwest ku nêrîna xwe li ser min ferz bike, da bêje ku tirk di tiştê li dijî Sûriyeyê de rast in û ew tiştên ne rast ên Sûriye li ser komkirina çekdaran li ser sînor tiştekî erzan û vala ye.

Ez bi otomobîla kompaniyê çûm ofîsê û min roja vegera xwe da xuyan, min hew dît ku berpirsiyarê ofîsê pirsa navê min ji min dike û ji min re dibêje ku hinan di riya telefonê re li min pirsîne û wê bên min bibin. Piştî demeke kurt sekreter di gel xortekî rojnamevan ê xweyî ramanên pêşverû hatin û min birin hotêlê, û li wir min Inayet Remzî û yekî din ji şanda Sûrî dîtin. Du kesên din ji şanda Tûnisî herduwan navê



Ala Kurdistanê a ku Rewşen Bedirxan biribu kongreyê. Vega li Hewlêrê li mala Sînemxan Bedirxan e.

sala ye, bi zorê deng dibihîst, li ser kurdan gelek tişt dizanîbû, lê kesekî paşvern, rûşikestî bû. Serdana min ji wî re kurt bû û 17 Draxma bi sawa wê serdanê min danîn. Piştre ez vegeriyam ofîsê û min sê kesên yonanî naskirin ku giraniya wan di civakê de hebû û yek ji wan avokat û helbestvan Savas Hodjî bû. Wî malbata me nas dikir û taypkirina gotina min da ser xwe da wê ji min re li Ronyo xîne ku bikaribin li kesên beşdar belav bikin. Mirovekî gelekî dilnazik bû. Mamoste keçek bi min re bi rê kir heta westgeha basan, da ez kiriya otomobîlan zêde nedim, ji ber kiriya basê 4 Draxma bû û rê 40 deqîqeyî direj kir. Bi rastî jî yonanî ji kesên biyanî hez dikin, ji ber rûnîştiyên basê û şofêrê wê gelekî guh dane min û ez li cem hotêlê peya kirim.

Li hotêlê, min program wergirt û tê de nûçeya hatiyan di wê rojê de, ji Fransa û Tûnis û Marakeş. Wê civîn saet neh û nîv be, ezê bizava xwe bikim ku amade bibim, tevî ku civîneke vala ye.

Saet neh û nîv ez daketim hola hotêlê da ku beşdarî civînê bibim. Yonanî xerîkî rêxistina civînê bûn û dema Mamoste Hodjî ez dîtim tevî çend hevalên xwe hat û ez bi wan dam naskirin ku ez kurd im û kalikê min mîrê Cizîra Botan bûye û em piştî wê li dinyayê belav bûne.

Fatih Esbîro ê helebî hate ba min û ji min pirsî bê min Muzher Elşerbecî dîtiye an na. Gava min bersiv da û min got min ew bi Mamoste Efleq re dît, Esbîro ji min pirsî ku bi te re axivîne ji bo hatina te û beşdarbûna te di kongreyê de. Min got na, rabû go, li bendê be wê bê bi te re biaxive. Ji Şerbecî re gotibûn lê xwe kir ku weke ji nişkê ve ez dîtime û rûnişt da bi min re guftûgoyê bike li ser hatina min. Çawa ez hatime û çima ez ji ber kurdan ve hatime. Ez ji Sûrî me û li Sûriye kêm milet tunene, em tev de welatiyên Sûrî ne û... Min jê re got hûn di ber kurdan de biaxivin. Ezê xwe ji civînê bikişînim û

xwe negotin. Ez çûm oda xwe piştî ku ez bi serok û jina wî re axivîm. Herduwan dawa lêborînê ji min xwestin ji ber derengiya gihiştina min bê pêşwazîkirin.

Oda min biçûk e û ez lê vehesîme, ku hejmara me pirtir ba wê rewş xweştir baya. Min gelek bizavên xwe kirin. Sekretêr ji bona danîna ala welatê min di civînan de soz da min.

Saet 09:30 ez daketim hola hotêlê û min û avokatê helebî Fatih Esbir hevnasîn çêkir, piştre xanim Sîlvî Meşaqa hat û silavek germ kir, lê Inayet Remzî bi sarî silav kir, û ew sariya ku li ser şanda Sûrî xwe girtibû tiştekî xerîb bû û gelekî jî xerîb bû. Ez nizanim bê çima wisa bû.

Mamoste Esbîro ji min pirsî bê çawa ez hatime û çawa ez vexwendî bûme û gelo ez li şanda Sûrî vegeriyame û hwd...

Min jê re bi rastî got ku ez ji ber miletê xwe ve (kurd) û netewa xwe ve hatime, ji ber ku ew bindest in li Iraqê û Tirkiye û Îranê û nikarin derkevin. Ji ber dîtin ku min ji ber xwe bişînin, ji ber Sûriye welatekî demokrat e û xêrê ji cînarê xwe re dixwaze.

Min hîna Mamoste Efleq nedîtiye û ez nizanim bê wê helwesta wî çi be. Saet sisê ez ji oda xwe daketim, ji ber berî wê ez daneketibûm ji bo xwarinê. Min sekretêra yekemîn dît û pê re Mamoste Hekîm ê ku ji Antakyê bû û hevalê Memdûh Selîm û dostê gelek kurdan bû. Ew li vir qonsol e Muzher Şerbecî û Kamil Hemarne jî pê re bûn. Piştî kurtedemekê Mamoste Efleq jî hat û li pêşiya civatê rûnişt û yên din hemû bêdeng man. Bi ya rojnamevan re diaxivî, bi kurtî bersivê wê didan û wê gelek pirs dikirin. Çavê wî li ser min bûn, li ala Kurdistanê a bi ser singa min dinêrî.

Piştî wê ez bi a serok re hinekî derketim gerê Mamoste Hekîm jî li gel me bû. Min ew baş naskir di nav de Kesekî ji sûriyan xwe nêzîkî min nedikirin ne ji dûr û ne ji nêzîk ve. Ez çûm ba Mamoste Mosko Bolî, ew jî şexsekî temen wî dora 85

bêdeng bim... Dema dît ku bi min nikare, ji min re got ku ê ji ber Sûriye ve biaxive Efleq tenê ye. Şanda Sûrî ji 12 kesan pêk tê û çênabe hemû biaxivin. Û got ku wê sekretêriya kongreyê agahdar bike da min tevî şanda Sûrî bikin. Min bi a wî nekir û got: ev tişt çênabe, lê ez dikarim bêdeng bim dema hûn rahêjin vê babete û hûn li ser kurdan biaxivin... li ser berberiya tirk û farsan û hovîtiya wan... Wê gave xem nîne ku kursiyê Kurdistanê vala bimîne. Got divê tu li Mamoste Efleq vegerî û hûn li ser van xalan guftûgoyê bikin berî li darxistina civînê. Piştî kurtedemekê min xwe ji civatê kişand. Min wisa kir ku ez westiyayî me, da ez xwe ji destê wan xelas bikim. Bi rastî jî ez ne amade bûm, ne oda xwarinê ne di firavînê de û ne jî di şîvê de, min xwe nexweş kir û tenê şîr vexwar.

Birêz Hodjî ji min xwest ku ez gotina xwe kurt bikim da di rojnameyên îro de belav bibe. Min xwe bi wê gotinê mijûl kir.

Ez hîna li oda xwe me. Qehwê vedixwim. Saet nêzîkî heşt û nîv e. Ezê saet deh dakevim, ji ber wê rûniştina yekemîn li darkeve. Xem nîne li ser min û karê (wezîfa min) min, dema ku em gavekê bi pêş de bavêjin.

Ji qesta min xwe pênc deqîqeyan dereng xist û ez çûm civatê. Min dît ku cihê min hatiye birrîn û ala Kurdistanê ne li ser e. Min gelek guh neda vê meselê û ez bi yonaniyan re rûniştim, bêyî xwe nêzîkî kesên din bikim.

Gotin ji qubrisiyan û misrî û tûnisiyan re bû, tevî nameyekê ji Mekaryos. Saet duwazdeh û nîv civîn bi dawî bû, da bihna xwe vekin dora sîh deqan. Gotinên misrî û tûnisiyan xweş bûn, ku bi cih bihatana.

Saet yek fikrê xwe guhertin û gotin ku wê civîn saet çar dest pê bike. Di wê bihnvedanê de min avokatek jin a yonanî nas kir û em gelekî li ser pirsa kurdî axivîn. Bi taybetî dema sekretêr hat û ala ku amade kiribû bi şevê nîşanî min da. Ew ala ku wê diyarî min bike da bibe ji bîranînên vê kongreye.

Çavên sûriyan bi dû min de bûn, gerek e hay ji xwe hebim. Rûniştina min li kêleka Mamoste Hekîm bû, bi tenê ew cirxweş bû di nav wan de. Şerbecî xwest min bihingirîne lê tu sûde negirt. Min silav li Efleq kir, wî xwest ku bersiva wî nermik be.

Saet yek û çaryek ez ji hotêlê derketim da birevim ji vê rewşa civatê a nexweş, û ez saet sisê û nîv vegeriyam. Bi vî hawî bû ku ez li ser şîva balefirê me heta vê kêlîkê. Ez bê xwarin mame.

Li ber dergehê holê ez pêrgî wê rojnemevanê bûm. Ji min pirsî: ev tu li kû yî? Min te winda kiribû. Piştre nêzîkî min bû da ji min re bibêje ku şanda Cezayirê dengê xwe bilind kirine li dijî temsîla Kurdistanê. Ez keniyam û min bersiv neda. Piş-

DIYARÎ BO SEDSALIYA
REWŞEN BEDIRXAN



Dotmam welê ye, heta mirov xwe nas dikit mirov emrê xwe xelas dikit.
Hon hemî ji min, ji me re bûn. Me kîjan bixwesta, ne ewê, ne mamên me, ne digotin no. Lê min, me hemiyan nizanî bûn. Çavên me bi we, bi bedewiya can û giyanê we ne diket.
Me dev ji we berda bûn. Yekî biyanî dihat, hon dixwestin. Me ji xwe re ne dikir namûs. Hon dibirin. Hon bêqedr dikirin. Di rêzika dinyayê de hon tayih dibûn. Ev ne sûcê we, lê yê me bû.
Hon di gulistana mala me de gul û bişkojin bûn. Baxvan û dîdevanên we em bûn. Bihna we a xweş, rengê we ê geş û birewş tu dibêjî qey ne ji me re bûn. Em pê ne dihesiyan. Me ew ne didîtin. Himbêza xwe veke ez ji te re têm. Min himbêz bike. Min wek mêr, pismam û her tiştê xwe maço bike. Were dotmam were, ez stûna heyîna te a stiwar im, tu jî bibe rewşa jiyîna min a Rewşen.

Celadet Alî Bedirxan

www.avestakitap.com
ISBN 978-9944-382-74-8
9 789944 382748
avesta